

LI TIRKÎYÊYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ
DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA
SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

KEiG

kadın emeđi ve istihdamı giriřimi
women's labor and employment initiative



PÊŞGOTIN	05
I. DESTPÊK	06
II. BERGEHA SÎGORTAYÊN CIVAKÎ WEK ŞEXSÎ	09
2.1. Têkiliya Sîgortedarî ya Mecbûrî	09
2.1.1. Jinên Ku Bisîgorte Hatine Jimartin	09
2.1.2. Jinên Ku Bisîgorteya Qismî Hatine Jimartin	12
2.1.3. Jinên Ku Bisîgorte Nehatine Jimartin	13
2.1.4. Jinên Ku Sîgortedariyên Wan Bi Taybet Hatiye Li Dar Xistin	14
2.2. Têkiliya Sîgortedariya Li Gor Daxwazê	16
III. ŞAXÊN SÎGORTEYA CIVAKÎ	19
3.1. Şaxên Sîgorteya Biwade ya Kin	19
3.1.1. Sîgortayên Qezaya Kar û Nexweşiya Pîşeyî	19
3.1.2. Sîgorteya Nexweşiyê	21
3.1.3. Sîgorteya Dayîkî	21
3.2. Şaxên Sîgorteya Biwade ya Dirêj	24
3.2.1. Sîgorteya Pîrîtiyê	24
3.2.2. Sîgorteya Mirinê	31
IV. SÎGORTEYA TENDURISTIYA GELEMPERÎ (GSS)	37
VI. ENCAM	43

PÊŞGOTIN

Ewlehiya civakî ji bo pêşveçûyîna birûmet û ji kesayetiya me re mafêke pêdivî ye. Ji bo jinan jî temînata herî girîng e ku bi wî jiyaneke bêbendewar bijîn.

Wek Platforma KEÎGê di sala 2008an de, Zagona Sîgortayên Civakî û Sîgorte ya Nexweşî ya Gelemperî ku hê wek pêşnûma ye, ji ser peymanên ku ji jinan re hatiye dayîn li serê sekiniye û raporeka mafên ku ji jinan re hatine pêşkêşkirin û windabûyîyan derxistiye holê, me amade kiribû. Di vê raporê de, mafên ku ji xwe sinordarkirî ne, bi zagonê ve bêtir dê werin tengkirin me anîbû ziman.

Piştî zagonîbûna pêşnûmayê û di encama guhertinên ku di zagona torbeyê de hatiyeçêkirin, li Tirkîyeyê ji hêla jinan ve ji nû ve li ser sekinîna sîstema ewlehiyê wek pêdiviyeka girîng li ber me disekinî. Ji hêla din zimanê zagonê û her sal bi madeyên ku tîna îlawekirin yan jî tîna derxistin binyata wî bêtir tevlihev kiriye û ev rewş pêdiviya pêşkêşkirina meseleyên ku me jinan eleqedar dike derxistiye holê. Ji lew re, rapora ku di destê we de ye, sîstema ewlehiya civakî yê ji hêla jinan ve û ji bo jinan dahûrîne.

Li Tirkîyeyê jin di sîstema ewlehiya civakî de li ku derê ne? Karên ku jin di nav xaneyê de û dervehiya xaneyê de dikin ji aliyê sîstema ewlehiya civakî ve tê dîtin? Di nav vê sîstemê de bi rêkûpêkkirinên ku ji bo jinan hatine çêkirin pêdiviyên jinan pêrgîni dike? Rapora ku me bi van pirsan amade kiriye, li ser mijarê ji bo biberfirehî gengeşî bikin vekirina qadekê armanc girtiye û sîstema ewlehiya civakî ya Tirkîyeyê ji hêla jinan ve dinirxîne. Em spas dikin ji bo Bjk. Fatma Şenden Zirhî, Yrd. Doç. Nagihan Durusoy Öztepe ji ber ku amadekirina vê xebatê girtine ser xwe û ji ber rexne û tîkariyawan a hêja em spas dikin ji endamên Platforma KEÎGê re.

Platforma KEÎGê
Tîrmeh 2015

RÊZA WEŞANÊN KEİGÊ: RAPORA PÊŞLÊGERÎNÊ LÎ TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE? JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ VE DAHÛRANA QANÛNA SSGSSYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

I. DESTPÊK¹

Armanca vê xebatê, li Tirkîyeyê binyata referansa sepanên ewlehî ya civakî ya bi hejmar 5510ê ya Sigorteya Civakî û Qanûna Sigorteya Nexweşî ya Gelemperîyê ji aliyê jinan ve bi dest xistin e.

Wekî hemû sepanên politikayên civakî, sistema ewlehiya civakî jî divê bi bergeha civakî ya zayendî were dahûrandin. Di xebatê de pêşiya pêşî, bergeha sigorteya pêdivî ji hela şexsî ve were ravekirin. Di vê beşê de bi vekolandinê têkiliya sigortedarî, di bergeha sigortedariya pêdivî û sigortedariya li gor daxwazê de; kesên ku bisigorte werin jimartin û yên ku neyên jimartin û hêmanên sigortedarîya li gor daxwazê were ravekirin.

Di beşa düyemîn de, şaxên sigorteya civakî were vekolandin. Di vê bergehê de, şaxên sigorteya biwade ya kin, şaxên sigorteya biwade ya dirêj dê were analîz kirin.

Di beşa sêyemîn de jî, li ser sigorteya nexweşî ya gelemperî were sekinîn. Di beşa dawî de jî nirxandineka gelemperî dê were kirin.

“Ewlehî” pêdiviyek girîng e ku ji hebûna mirovatiyê ve bi heman awayî didome. Pêdiviya hêvişandinê ya li ber rîskên wek nexweşî, seqetî, pîritî û mirinê, zor daye mirovan da ku bi tena serê xwe yan jî bi civatê re bergiriyên bigirin.

Ev pêdivî ku wekî dîroka mirovatiyê kevn, bi derbasbûyina civaka pişesaziyê de zêdetir bûye; ev rewş, teknîkên ewlehiya civakî ya kevneşopî, di têkoşîna li ber rîskên civakî de ev nêrîna ku di jwariya bandêrbûna bi tena serê xwe

1 Ev rapor ji aliyê Dr. Fatma Şenden Zırhlı û Yard. Doç. Nagihan Durusoy Öztepe, tşkariya endamên hêja ya KEİG û KEFA yê ve hatiye amade kirin.

yê xurt dike û di derketin û pêşketina sîstemên ewlehiya civakî ya zêdetir sazîtî yên ku bi destê dewletê ve pêkhatine de rol girtî ye.

Ewlehiya civakî, di nav bername û sepanên politikayên civakî de xwedî cihekî girîng e.

Du taybetiyên ewlehiya civakî heye ku wî, di nava sepanên politikayên civakî de girîngtir dike.

Ji van ya ewilî, wesfa hemgelibûyîna ewlehiya civakî ye. Bi berfirehî ewlehiya civakî, ji ber ku ne tenê xebatkarên xwe, di heman katî de ew kesên ku lînêrîna wan di binbariya xebatkarên xwe de ne û kesên ku li dervehiya jiyana xebatê mane jî dixê nava xwe, hemû civakê têkildar dike.

Ya düyem, ewlehiya civakî, jiyana mirovan de ne tenê di dewrekî de heye. Ji bûyîne heta mirina mirovan û piştî mirinê kesên ku li paş dimînin jî ji ber ku dixê nava xwe, di hemû dewrên jiyana mirovan de cîh digre.

Bi tarîfeka giştî em dikarin bibêjin Ewlehiya Civakî, ji ber rîskên pişeyî, fizyolojîk an jî sosyo-ekonomîk, debarkirin û bergirî kirina pêdiviyên jiyîna ew kesên ku derameta wan yan jî qezenca wan domdar yan jî demborî hatiye birîn û ew kesên ku bi hin sedeman daçûnên wan zêde bûyê, ji bo van mijaran tedbîrên ku ji hêla dewletê ve hatiye girtin îfade dike.

Bi vî awayî Ewlehiya Civakî çewa ku ew rîskên wek pîrîtî, mirin û bêkarî ku di derameta kesan de sedema kêmbûn û birîne dibin dixê bergeha xwe; û wek zewicîn û zarok anîn ku di jiyana mirovan de bûyerên erênî tèn pejirandin; lê ji ber ku daçûnên malê zêdetir dike, ji bo ewlehiya civakî ev talûkeyên xeternak jî dixê bergeha xwe. Fonksiyona esil ya Ewlehiya Civakî, piştî ku ew rîsk derketin holê, bi rêk û pêk kirina zaiyatên ku di derameta kesan de peyde bûne ye. Di peymanana ILOyê ya bi hejmar 102 Zagonên Asgarî yên Ewlehiya Civakî de 8 heb rîskên ewlehiyê hatiye ravekirin. Vana; qezeya kar û nexweşiya pişeyî, nexweşî, dayikatî, seqetî, pîrîtî, mirin, bêkarî û sigorteya pêdaniyên malbatê ne. Lê li Tirkîyeyê ew rîskên ewlehiya civakî ya ku li jorê hatine jimartin, di bin çar şaxên cuda yên sigortayê de hatine berhev kirin. Şaxên sigorteya biwade ya kin, qezaya kar - nexweşîna pişeyî, nexweşî û rîskên dayîkatîyê; şaxên sigorteya biwade ya dirêj, rîskên seqetî, pîrîtî û mirinê dihêwirîne.

Sigorteya bêkariyê û sigorteya nexweşiya gelemperî ji wek şaxên cuda hatine pêkanîn.

Sigorteya pêdaniyên malbatê hê li Tirkîyeyê nehatiye damezrandin.

Li Tirkîyeyê pêkanîna şaxên sigortayên cuda û kesên statûya sigortadariyên cuda ne, xistina wan a di bin bana ewlehiya civakî de di nav heyamek dirêj de belav bûye².

2 Bnr îlawe 1. Li Tirkîyeyê Dîroka Sistema Ewlehiya Civakî

Bi demê re firehbûna bergeha sîgortayên civakî, kesên ku li Tirkîyeyê dixebitin, bi rêkûpêkkirina maf û binbaritiyên wan a li gor qanûnên ewlehiya civakî yên cuda derxistiye holê.

Ev rewş heta îro, di navbera sepanên ewlehiya civakî de xirabûna yekîtiya zagon û standardan bi xwe re aniye. Ji ber mebesta peydekirina yekîtiya zagonê, bi qanûna di dîroka 2006 û bi hejmar 5502 yê Saziya Ewlehiya Civakî hatiye pêkanîn. Bi vî awayî, Saziya Sîgortaya Civakî, Rêvebirîtiya Gelemperî ya Sindoqa Malnişînê û Rêvebirîtiya Gelemperî ya Bağ-Kurê di bin banekî heman de berhev bûna wan hatiye derpêşkirin. Pêvajoya peydekirina yekîtiya zagon û standardê bi qanûna Sîgorteya Civakî û Sîgorteya Nexweşî ya Gelemperî ku di dîroka 01.10.2008 an de bi hejmar 5510ê re ketiye meriyê dewam kiriye³.

Lê bele dîsa ji ne mimkun e ku em behsa yek hejmarîyekî aşîkar bikin; lewra statûyên 4/a, 4/b û 4/c derketine holê. Statûya 4/ayê kesên bi SSK, statûya 4/byê kesên bi Bağ-kur, statûya 4/cyê jî bi Sindoqa Malnişînê û tabîî zagona bi hejmar 657 çarçove dike.

Li Tirkîyeyê ewlehiya civakî bi gelemperî ji ser du sîstemên a ‘bîprîm û bêprîm’ ve tê saz kirin. Sîstema bîprîm, ji şaxên sîgorteya biwadeya “Kin” û “Dirêj” û sîgortayên nexweşî ya gelemperî ku ji aliye Saziya Ewlehiya Civakî ve tê meşandin pêk hatiye.

Şaxên sîgortayên biwade ya “Kin” û “Dirêj” ku ji aliye SGK yê ve tê meşandin û ji sîgortayên bêkarî û nexweşî ya gelemperî pêk hatiye.

Sîstema bêprîm; ku bi qanûnêncur bî cur ve hatiye bikeyskirin, Alîkariyên Civakî ku ji bo kesên hewcedar re tê dayîn û xizmetên ku ji bo malbat, zarok, berbend û pîrên hewcedar re tê dayîn dixê nava xwe.

Têgeha ewlehiya civakî ji madeya 22 yemîn a ‘Beyannameya Ramanên Mirovan tê. Li gor vê madeyê, “Wek endameke civakê herkes xwedî ramanê ewlehiya civakî ye.”⁴ Ramanê ewlehiya civakî ji bo rûmet û kesayeta herkesî bi awayekî serbest xwe bigihêjîne pêdiviyek e. Lê ev maf, ji bo gelek nifûsê dinyayê re hê jî pêk nehatiye.

Kesên ku ji mafê ehlehiya civakî xaric hatine girtin pêşiya pêşîn bi taybetî di civakê de yên ku li derveyî hatine hiştin û yên ku keda wan nayê ber çavan jin in. Ji bo jin karibin bêyî ku bi kesî ve girêdayîbin bijîn ewlehiya civakî garantiyek e.

Lê belê ji jinan tenê beşek di bin şemsiya ewlehiya civakî de cih girtine. Ew jî li hemberî hin tengkirinan wek rêjeyên primên zêde, hejmarên rojên dayînen ya primên dirêj û wek şerta temenê ve tîn hiştin

3 <http://www.sgk.gov.tr/wps/portal/tr/kurumsal/tarihce>

4 Manifestoya Mafên Mirova ya Hemgelî, <http://www.tbmm.gov.tr/komisyon/insanhaklari/pdf01/203-208.pdf>

II. BERGEHA SÎGORTAYÊN CIVAKÎ WEK ŞEXSÎ

2.1. Têkiliya Sîgortedarî ya Mecbûrî

Têkiliya sîgortedariya mecbûrî; têkiliya giştî ya ji Saziya Sîgorteya Ewlehiyê û di navbera kesên bisîgorte û kardêran dewek avakirî; û wek ji îradeya her du hêlan serbixwe, li gorî hukmên qanûna ewlehiya civakî ku pêkhatiye.⁵ Lewma, kesên ku di bergeha vê qanûnê de ne, mecbûrî bisîgorte tên jimartin. Ev mecbûrbûyîna sîgortedariyê, tê wê wateyê ku hêlan bi îradeya xwe nikarin maf û binbariyên sîgortedariyan ku ji vê qanûnê derketiye, ji holê rakin yan jî kêmkirin. Di bergeha têkiliya sîgortedariya mecbûrî de li gorî vê qanûnê yên ku bisîgorte tên jimartin, ji hêla hin şaxên sîgortayê ve yên ku qismî bisîgorte tên jimartin û yên ku bisîgorte nayên jimartin dê were daxuyanî kirin.

2.1.1. Jinên Ku Bisîgorte Hatine Jimartin

1. Jinên bi aqda xizmetê ji aliyê gelek kardêran ve tên xebitandin, li gorî qanûna bi hejmar 5510 ê bisîgortayê 4/a yê ve tên wesfandin.

Bisîgortayên 4/ayê pêşdetir kesên ku di bergeha bi hejmar 506ê ya SSKyê de ne dixê nava xwe. Li gorî vê di bergeha 4/ayê de jinên ku wek bisîgorte werin nirxandin ev in:

- Sendîqa û komheviyên karkeran û serokên polên sendîqayan û kesên bijartî yên ji bo civata rêveberiyê re, Kesên ji hêla yek an jî ji yekî zêdetir kardêran ve tên xebitandin û tabloya ji hêla Wezîriya Çand û Tûrîzmê ve hatiye diyar kirin; hûnermendên ku film, şano, sehne, rapêşî, deng û sazê û hin mijûlahiyên wek mûzîk, peyker, dekoratîf û hwd... di şaxên hunerên spehî de dixebitin û bireweran û nivîskaran,
- Sendîqa û komheviyên karkeran û serokên polên sendîqayan û kesên bijartî yên ji bo civata rêveberiyê re,
- Kesên ji hêla yek an jî ji yekî zêdetir kardêran ve tên xebitandin û tabloya ji hêla Wezîriya Çand û Tûrîzmê ve hatiye diyar kirin; hûnermendên ku film, şano, sehne, rapêşî, deng û sazê û hin mijûlahiyên wek mûzîk, peyker, dekoratîf û hwd... di şaxên hunerên spehî de dixebitin û bireweran û nivîskaran,
- Ji kesên rajêrên biyanî, koçber, penaber ku bi xizmeta aqde dixebitin⁶,

5 Y. Alper, Sistema Ewlehiya Civakî ya Tirk û Hiqûqa Sîgortayên Civakî, 2014.

6 Wek tîkildariyabi esasa beramberiyê ve kesên di tebaya li welatên ku peymanana ewlehiya navneteweyî hatiye çêkirin de li

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

- Wezîrtiyên parastina mal û milkên cotkar yan jî cerdevanên parêzvan ku ji hêla meclîsa wan ve tîn xebitandin⁷,
- Karkerên seksê⁸,
- Kesên ku ji hêla Wezaretê Hevotina Netewî ve wek hînkêrê hoste tîn xebitandin,
- Kesên ku li kargêriyên giştî de bi bergîdana serê seetekî ve hatine wezîfedarkirin,
- Ên ku di bergeha benda (C)yê, madeya çaremîn a qanûna Memûrên Dewletê ku bi hejmar 657ê ve hatine xebitandin.
- Kesên ku ji bernameyên xebata ji bo feydeya civakê ya ji hêla ÎŞKURê ve hatiye li dar xistin de sûd wergirtine⁹,

2. Kesên ku bêgirêdana aqda xizmetê ve li ser navê xwe û ji hêla xwe ve xweser dixebitin di bergeha vê qanûnê wek bisîgorteya 4/byê tîn pejirandin. Sîgortebûyîna 4/byê, kesên ku di bergeha bi hejmar 1479a kevn a BAĞKURê de dixebitin û kesên di bergeha bi hejmar 2926ê ya BAĞKURa Cotemeniyê de dixebitin dixê nava xwe. Li gor vê jinên ku li jêr hatine jimartin wek sîgortedariyên 4/byê tîn pejirandin:

- Muxtarên gund û taxan,
- Ji kesên ku bêgirêdana aqda xizmetê ve li ser navê xwe û ji hêla xwe ve xweser dixebitin;
 - kesên ku ji ber qezenca bazirganî yan jî qezenca pişeyî ya serbest ve, di derameta rasteqîn yan jî asayî de binbar in,
 - kesên ku ji baca derametê mîaf û herwiha di tomara dikandar û hunermend de qeydkirî ne,
- Kesên ku hevparên şirketên wan hene,
- Kesên ku fealiyetên cotemeniyê dikin (Cotkar)

derveyî mane,

7 Kesên ku li gor qanûna di derheqê Parastina Malên Cotkaran, bi dîroka 2/7/1941ê û bi hejmar 4081ê ve tîn xebitandin,

8 Jinên ku di qanûna bi dîroka 24/04/1930 û bi hejmar 1593 Hıfzısıhha ya Umumî de hatine diyar kirin,

9 Binbariya dayîna primên van kesan li ser ÎŞKURê ye. Encax ÎŞKUR wek kargêr û kardêra van kesan nayê jimartin.

- Jokey û mideriban¹⁰ (antrenor)

3. Kesên ku di kargêriyên giştî de¹¹ dixebitin, di bergeha vê qanûnê de wek bisîgorteyên 4/cyê tîn pejirandin. Memûrên li gor vê statûya hiqûqê tîn xebitandin; wek kesên karmendên peymananî ku di bergeha 4/1-ayê de ne bisîgorte nehatine derpêş kirin û kesên ku qanûna Memûrên Dewletê bi hejmar 657 li gorî pêdiviya madeya 86. ve wekil hatine tayînkirin bisîgortayên 4/cyê ve hatine jimartin.

Wekî ku di Tablo 1'an de jî tê dîtin, Li Tirkîyeyê di nava kesên sîgortedar de rêjeya jinan li gor mêran gelekî kêmtir e. Ev rewş bi piranî jî ber ku jin li gorî mêran kêmtir di jîyana xebatê de cih digrin diqe îstifade dikin an jî ji bilî stariya civakî de dimînin

Tablo 1. Rêjeya Jinên Bisîgorteyên Mecbûrî Ku Di Bergeha Madeya 4. a Qanûna Bi Hejmar 5510Ê, 2013

4-1/a Bisîgortayên Mecbûrî		4-1/b Bisîgortayên Mecbûrî				4-1/c Bisîgortayên Mecbûrî
		Xebatkarên Serbixwe 1479 S.K		Kesên di Fealiyetên Cotemeniyê Dikin 2926 S.K		
Jin	Mêr	Jin	Mêr	Jin	Mêr	Jin
%25,5	%74,5	%20,8	%79,2	%14,7	%85,3	%32

Çavkanî: Ji îstatîstîkên SGKyê hatiye berhevkerin.

Bastûra ewlehiya civakî, ji gihaniya ewlehiya civakî ve derkiriye jî bo gelek jina ku neketine di nav jiyana xebatê. Li Tirkîyeyê bastûra ewlehiya civakî, aresteyî xebatê ye û bi dayîna prîman têkarî kirine re starî ye, ev

Qismek girîng jî jinan, ji ser mîrên xwe di statûya 'sîgortedariya pêgirtî' de ji kiriyariyên ewlehiya civakî feyde digrin yan jî di dervehiya şemsiyeya hêvişandina civakî de dimînin.

10 Kesên ku di bergeha bi dîroka 10.07.1953 û bi hejmar 6132 "Qanûna Di Derheqê Xarana Hespan" de fealiyet dikin.

11 Di madeya 3/21. a bi hejmar 5510 qanûna Îdareya Giştî de; bi dîroka "10/12/2003" û bi hejmar 5018 a Rêvebiriya Malî ya Giştî û bi fiqreyê yekemîn benda (a)yê ya madeya 3. a Qanûna Qontrolê de ku hatiye diyarkirin, îdareyên giştî û teşebûsên giştî ya îktîsadî û bi girêdayî îdare, şîrikî, sazî û firmayê wan û ji xwediyê şîrîkeyê ku li jorê hatine behskirin sermayeya wan ji %50î zêdetir in û bi jî saziyan ku ne tabîê 'Qanûna Bazirganî ya Tirk' an û wek saziyên giştî ku li gorî qanûnên taybet karmend dixebitînin" hatiye terîfkerin.

Tevîhevbûna Halên Sîgortedariyê

Di qanûna bi hejmar 5510e de bi keyskirinek din jî, madeya ku tevîhevbûna halên sîgortedariyê derpêş dike ye. Li gor vê, kesên bisîgorte dê bikaribe di heman demê de tabîê bi statûyên sîgortedariyên (a) û (b) yê û statûya sîgortedariya (c) yê be, bi vî şiklî kesên bisîgorte gava bikeve bergeha vê qanûnê pêşîya pêşîn di bergeha fikreya yekemîn benda (c) yê ya heman madeyê de dê bisîgorte were jimartin. Kesên bisîgorte di heman demê de heke tabîê statûya him 4(a) yê him jî 4(b) yê bibe, dê bergeha statûya 4(a) yê bisîgorte were jimartin. Encax, ji ber sedema li hev aliqîna halên sîgortedariyê, kesên ku sîgortedariyên wan di bergeha 4(a) yê de hatiye qebl kirin, dest bi dayîna primên ku piştî ku daxwaza nivîskî kirine; ji aliye mafên sîgorteya qezayê kar û nexweşîya pîşeyî ve di bergeha statûya sîgortedariya 4(b) yê, bi alîkariyên dîtir ên ji şaxên sîgorteya biwadeya kin (ango sîgorteya dayîkî jî navxwe de) û ji aliye alîkariyên ku ji şaxên sîgorteyên biwadeya dirêj ve hatine peyde kirin, evan di bergeha statûya sîgortedariya benda 4(a)yê tîn nirxandin.

*2.1.2. Jinên Ku Bisîgorteya Qismî Hatine Jimartin*¹²

Kesên ku qismî bisîgorte tîn jimartin ne bi hemû şaxên sîgortayê ve; tenê bi hin şaxên sîgortayê ve bisîgorte tîn jimartin.

2.1.3. Jinên Ku Bisîgorte Nehatine Jimartin

1. Hevser û zarokên ku di kargeha kardêrê de bêpere dixebitin,
2. Di heman xaneyê de kesên ku bi hev re dijîn û di navbera xisman de ku xisma dereceya sêyemîn jî tê de ye, bêyî ketina kesên din ên ji derveyî; kesên di karên ku li nav xaneya ku tê de dijîn de dixebitin,
3. Xwendekarên ku di dibistanên hunerî de ku bi destûra meqamên fermî avabûne yan jî di zanîngehan de fiêlî di nav dema perwerdehiyê de û wek ji perçeyek perwerdehiya wan di xebatên avakirin û tamîratê de dixebitin,
4. Kesên ku, wek ji perçeyek xizmetên başkirinê ku di navendên rehabilitasyonan de tîn dayîn û ev xizmetên ku li

¹² Ji xeynî yên ku di bin vî sernivîsê de hatine behskirin, Seqetên Herbê û kesên li gorî pêdiviya qanûna Têkoşîna Terorê meaş ve hatine girêdan, kesên ku di bergeha Qanûna Arizîkirinê de tezmînetî windakirina kar wergirtine û karkarên Tirk ên ji hêla kardêran ve ji bo şixulandina di cihên derveyî welêt de hatine birin, ev tev di bergeha vê qanûnê de kesên bisîgortayên qismî tîn jimartin.

saziyên tenduristiyê de tîn dayîn, kesên ku di xebatên ji bo hînbûyîna kar de dixebitin yan jî nexweş û seqetên ku rehebîlîte dibin,

5. Kesên 18a emrê xwe tije kirin e¹³,

6. Kesên di fealiyetên cotemeniyê dikin û ji dahatên fealiyetên cotemeniyê ya salane, nîvekiya meblaxa mehane ya piştî jê ketina mesrafên der barê vê fealiyetê, kesên ku qezanca wan a mehane di bin sînora jêrîn de bin û vê bi belge kiribin, ji kesên ku 65 salê xwe tije kiribin ji wan ên teleb kiribin,

7. Kesên ku dahata wan ji sînora jêr ya qezanca pîma esas kêr e ew li ser navê xwe û bi hesaba xwe serbixwe dixebitin,

8. Kesên ku di nûneriyên derveyî ya îdareyên giştî de hatine karpêkirin û kesên ku di mezreka sîgorteya ewlehiya civakî ya nûneriya li wî welatî de sîgortebûyîna xwe bi belge kirine,

9. Ji aliyê Wezaretê Ciwanî û Werzîşê, Rêvebirîtiya Werzîşê ya Gelemperî, Federasyona Fitbolê ya Gelemperî û federasyonên werzîşê yên serbixwe ve her cûr fealiyetên ciwanî û werzîşê û di perwerdehî, kemp û xebatên amadehiyê girêdayî van fealiyetan de kesên ku hatine wezîfedarkirin, bi şerta ku kar timî neyê pêşkeş kirin, ev kes li dervehiya têkiliya sîgortedariya mecbûrî hatine hiştin¹⁴.

Bi taybetî “hevser û zarokên kardêr yê ku bêpere dixebitin” nenirxandina wan ya di bergeha sîgortedariya mecbûrî de, ji aliyê gihaniya ewlehiya civakî ve ji bo jinan rewşekî gelek tengav derdixe holê.

Li gor agahiyên TÛIKê ya 2013ê, li Tirkîyeyê di nava hemû kardêran de rêjeya kardêrên jin tenê ji% 7,9 e. Lewma ji ber kardêrbûyîna rêjeya jinên ku bisîgorte hatine jimartin gelekî kêr e. Her çî qas li gorî Qanûna Medenî, hevser gava alîkariya hev dikin, divê li hêviya berjewendiyek madî nebin û ev her çî qas wek binyat were pejirandin jî, milkiyeta kargehê piranî li ser mêran e û hemû maf û qezencên ku ji ser xwedîbûna milkiyete qewimîne mêr dibin xwedî. Bi vê sepanê heke dewam kirina yekîtiya malbatê û refaha malbatê bê mebestkirin, wê demê divê milkiyeta

13 Di bergeha 4b û 4c yê ya qanûna bi hejmar 5510ê ji bo bibin bisîgorte, şerta tijekirina 18a emrê tê xwestin, lê ji bo xebatkarên ku di bergeha 4a yê de dixebitin sînordanîna emrê nehatiye dayîn.

14 Ji xeynî ku li jorê hatine jimartin qanûna bi hejmar 5510ê, kesên ku xizmetên leşkeriyê wek er û erbaş kirine û xwendekarên efserên çîgir, kesên ku sîgortebûyîna xwe ya civakî ya li derveyî welêt bi belge kirine û li Tirkîyeyê ji kesên ku li ser navê xwe û bi hesaba xwe serbixwe dixebitin, li derveyî welêt îkamet dikin û kesên ku tabîê mewzûata ewlehiya civakî ya wî welatî ji li dervehiya têkiliya sîgortedariya mecbûrî hiştine.

kargehê li ser kî be jî ev neye berçavkirin û bi vî awayî pêwîste ku tenê bi hebûna tîkiliya xebatê were pejirandin û jin jî bisîgorte were jimartin.

Ji hêla jinan ve sepanek din ku asteng derdixê di gihaniya misogeriya civakî de; di heman xaneyê de kesên ku bi hev re dijîn û di navbera xisman de ku xisma dereceya sêyemîn jî tê de ye, bêtî ketina kesên din ên ji derveyî; kesên di karên ku li nav xaneya ku tê de dijîn de dixebitin, rewşa nepejirandina bisîgortebûyîna wan e. Di heman xaneyê de jiyîn ji bo gelek jinan gihaniya wan a ewlehiya civakî asteng dike. Wek mînak; xatîyek ku li zarokê xwarzê/birazî yê xwe dinêre, heke bi xwarzê/birazî yê xwe re di heman xaneyê de neji, ji ber sedema lênihêrîna zarokan divê ew jin wek bisîgorte li sazîyê re were tescil kirin, lê heke di heman xaneyê de bîji mecbûriyeta sîgortebûyîna wê ji holê radibe¹⁵. Lewma divê, di heman xaneyê de jiyîn an nejiyîna jinan neyê nihêrtin yan jî ji tîkiliya hebûna xismtiyê wek serbixwe, heke li wî xaneyê “hebûna tîkiliya xizmetê” dabaş be divê jin bisîgorte were jimartin.

2.1.4. Jinên Ku Sîgortedariyên Wan Bi Taybet Hatiye Li Dar Xistin

Karkerên Cotemeniyê

Karkerên ku di cotemeniyê de bi aqda xizmetê ve domdar dixebitin ji SSKya Cotemeniyê ya bi hejmar 2925ê sudwergirtina wan dê bidome. Lê belê kesên ku di bergeha qanûna bi hejmar 2925ê ve bisîgorte ne, wana ji bo ku bikevin bergeha sîgorteya gelemperî divê di rêjeya ji%12,5 prîma sîgorteya tenduristî ya gelemperiyê bidin.

Piştî ku Qanûna SSGSSyê ya bi hejmar 5510ê merî bû hin madeyên (md 1, md 5, md 13, md 17, md 24, md 33, md 35) Qanûna bi hejmar 2925ê ji holê hilanî ye. Ev rewş bi taybetî kesên ku em wek karkerên demsalî rave dikin ku di cotemeniyê de di karên bêberdewam de dixebitin, wana di dervehiya şemsiyeya ewlehiya civakî de hiştiye. Encax ji ber hin bertekan di sala 2011an de zagona bi hejmar 6111 û ji Qanûna bi hejmar 5510ê re madeya 5. hatiye îlawekirin. Bi vî awayî kesên ku di Karên Cotemenî û Daristanê de bi aqda xizmetê ve dixebitin tîkiliya sîgortedariya wan bi taybet hatiye li dar xistin û bi vî awayî ketine bergeha Qanûna bi hejmar 5510ê.¹⁶ Li gor wê kesên ku di cotemeniyê de bêberdewam dixebitin, di bergeha madeya 4/aê ya Qanûna bi hejmar 5510ê ve bisîgorte hatine pejirandin. Qezanca ku bi esasa primê ve ye bi şerta di navbera sînora jêr û jorê de bimîne, li ser mêjera ku ewê diyar bikin, bitevahî dê ji%34,5 prim bidin. Prîma ku ewê bidin, ji %20 prîma şaxên sîgorteya biwade ya dirêj, ji %12,5 ya

15 <http://www.sgk.gov.tr/wps/wcm/connect/e0008d3e-7d2f-4e60-a751-2d3bdc1896e3/ev+hizmetleri.pdf?MOD=AJPERES&CACHEID=e0008d3e-7d2f-4e60-a751-2d3bdc1896e3>

16 “Ülkenin en garibanları sigortasız çalışır”, Ali Tezel, 3 Kasım 2014. <http://www.alitezcel.com/index.php?sid=yazi&id=7174>

Sigorteya Tenduristi ya Gelemperî (GSS), ji %2 jî prîma sigorteya Nexweşînên Pişeyî ya Qezayên Kar e. Kesên ku di cotemeniyê de bêberdewam dixebitin di sala 2015an de yên ku 22 roj prim dan ji ser 30 rojê bisigorte tên jimartin. Ew jî wek sigortedariyên din ji sala 2023yê ve her meh ji ser 30 rojê dê primê xwe bidin. Ango, tenê di hin heyaman de yên ku kar dibînin û yên ku rojaneya wan ji 30 TL yê derbas nabe û karkeran her meh ji berikên xwe bi dayîna meblaxên bilind dê bikaribin bisigorte bibin.

-Kesên ku destpêka wan ji 30ê Nisanê ya sala 2008ê yan jî destpêka wan beriya vê dirokê ne, meblaxa primên ya sigortedariyên cotemeniya 2925ê, di navbera diroka 1 Rêbendan -30ê Pûşperê ya 2015an de 195,24 TL; 1 Tirmeh -31ê Berfanbarê ya 2015an de 206,94 TL bû ye,

-Kesên ku despêka wan 1ê Gulana 2008an û piştî vê dirokê ne, mablaxa dayîna priman di navbera 1 Rêbendan - 30ê Pûşperê ya 2015an de li gorî mizeya kêmtirîn 303,98 TL; di navbera 1 Tirmeh -31ê Berfanbarê ya 2015an de dîsa li gorî mizeya kêmtirîn 322,20 TL ye.

Kesên ku destpêka wan beriya sala 2008an de ne, sînora jêrîn ya qezanca esasê, angu mizeya brut ya kêmtirîn û ji ser 15 rojê prim bidin, lê piştî 2008an de ji ser 22 rojê prim didin.

Jinên Karker Ên Di Xizmetên Xaneyê De Dixebitin

Di diroka 11ê Îlonê ya 2014an de merî bûye di bergeha zagona torbe ya bi hejmar 6552ê zagona bi hejmar 5510 û madeya 9. hatiye îlawekirin bi wî awayî di derheqê jinên di xizmetên xaneyan de dixebitin bi rûpêkkirinek nû hatiye çekirin. Li gor wê, kesên ku di xizmetên xaneyan de ji aliyê yek an jî yekî zêdetir kesan ve tên xebitin (Ev kes kardêr tên jimartin) û di mehekê de hejmara rojên xebatê ku li gorî mudeya seeta xebatê tê hesab kirin heke 10 roj û ji 10 rojê zêdetir be ew kes di bergeha 4 (a) yê ve bisigorte tên jimartin.

Di mehekê de ew kesên ku hejmara rojên wan ên xebatê ku li gorî mudeya seeta xebatê tê hesab kirin heke ji 10 rojê kêmtir be, kesên ku mudeya xebitandina xwe re wek birêje tên xebitandin, ew bixwe (li gorî zagonê ev kes wek kardêr nayên jimartin) ji primê re esas qezenca rojane ya di rêjeya ji % 2 sînora jêrîn de prîma sigorteya qezaya kar û nexweşîna pişeyî didin. Jinên ku di wê rewşê de ne ji sigorteya nexweşîna nikarin îstifade bikin. Sigortedariyên ku di wê pozîsyonê de ne ji bo ku karibin ji alîkariyên şaxên sigorteyên qezaya kar û nexweşîya pişeyî îstifade bikin divê ji tarîxa qezaya kar ku pêkhatiye ji wê tarîxê herî kêmtir 10 roj berê tescil kiribin û divê sigortedariya wan bidawî nebûbe. Ji bilî wê, ji ber qezayên pişeyî dayîna pêdaniya bikêrnehatinayan ji dahata ya berdewamî yan jî ji bo pêgirêdana mehane ya ji sigorteya seqetî, pîrîtî û mirinê û şerta dayîna hemû deynên primê peyda ye.

Bi vî şiklî kesên ku rojên xebata wan ji 10 rojê kêmtir in, meha primên ku li ser navê wan hatine dayîn bi şerta sih qatê ji qezanca heta dawîya meha din a ku wê mehê dişopîne bi rêjeya ji %32,5 (ji %20 sigorteya seqetî, pîrîtî û mirinê, ji %12,5 prima sigorteya nexweşiya gelemperî ye) dayîna priman ve di bergeha 4 (a) yê de bi sigortê tên jimartin. Encax, heke di nava vê mudeyê de primên ku nehatine dayîn êdî heqê dayînê diqede. Helbukî jinên ku di xizmetên xaneyê de dixebitin dijiwariyên ku dibînin û pereyê ku qezenc dikin gava were ber çav divê ev mudeya dayîna primê ew qas ne kin be û di pey de derfeta dayînê jî bê peydekin. Her çiqas beriya zagona torbeyê Qanûna bi hejmar 5510ê karkerên malê di dervehiya şemsiyeya stariya civakî de hiştibe jî; bi biryarên Dadgeha Bilind malên ku tê de dixebitin heftê rojekê jî herin, bêyî nihêrtina mudeya xebatê rêya bisigortebûyîna wan vebûbû. Encax bikeyskirina ku zagona torbeyê ve hatiye, biryarên Dadgeha Bilind ên ku ber li bisigortebûyîna karkerên malê vekiribû bê fonksiyon hiştiye.

2.2. Têkiliya Sîgortedariya Li Gor Daxwazê

Têkiliya sîgortedariya li gor daxwazê di madeya 50. a Qanûna Sîgorteya Civakî û Sîgorteya Nexweşiya Gelemperî ya bi hejmar 5510ê ve hatiye bikeyskirin. Li gor vê madeyê sîgortedarî ya li gor daxwazê, bi şerta prim dayîna li gor daxwaza xwe, tabîê şaxên sigorteya biwade ya dirêj (seqetî, pîrîtî û mirin) û sigorteya nexweşiya gelemperiyê peyde dike.

Di vê bergehê de ji bo bibin xwedî sigorte;

- Li Tirkîyeyê bi cih bûn,
- Xebitîna bi awayek bûyîna sigorteya mecbûrî hewce neke,
- Wek bisigorte di nav mehekê de kêmtî 30 rojê xebitîn yan jî tam roj nexebitîn,
- Ji ber sigortedariya xwe, xwedî meaş nebûyîn,
- Û şerta 18 salî emrê xwe tije kirin tê xwestin,

Mikelefiyeta primê jî, herî hindik ji mizeya asgarî ya brutê di rêjeya ji %32'an de bi hev re, ji bo heyama 01/01/2015-

30/06/2015an mehane, herî hindik 384 TL ye. Encax, ji sedema giraniya şertan weke ku di ‘tablo 3’ de tê dîtin dê were fehmkirin ku teleba sîgortedariya li gor daxwazê çî qas bêwate ye û him jî her roj ev teleb çî qas kêmtir dibe. Sîgortedariya li gor daxwazê beriya sala 2008an de, ji bo sîgortedariyên SSK, Bağkur û Sînduqa Malnişîniyê cuda cuda hatibû bikeyskirin; tîkiliya sîgortedariya ku di bergeha 4/b ya Qanûna bi hejmar 5510ê de ye bi heman awayê hatiye bikeyskirin. Li gor vê bikeyskirinê, ji bo ku kesên sîgortedariyên li gor daxwazê, heqê mehane ya pîrîtiyê qezenc bikin, divê di jinan de 58, di mêran de 60 salî tije kiribin; divê 9000 roj pîrîtiyê seqetî, pîrîti û mirinê agahdar kiribin. Piştî merîbûna zagonê mîjera pîrîtiyê ku divê bidin, 4/b, ango wek diravdana Bağkuriyan ku divê bidin mîjera 9000 roj pîrîtiyê dayînê, hatiye zêde kirin. (Made 51-Îlawe Fikre: 17/4/2008-5754/31 md.) Jinên ku tabî 4/byê ne ji bo ku heqê mehane ya pîrîtiyê qezenc bikin divê 58 salî bin û 9000 roj pîrîtiyê seqetî, pîrîti û mirinê agahdar kiribin. Ango divê 25 sal xebitî bin. Lewma jinên ku ji 30 rojê kêmtir dixebitin, malnişîniyê wan hema hema bêderfet dibe.

Ev jî, kêmtir bûna di hejmara sîgortedariyên li gor daxwazê îzah dike.

Tablo 2. Li Gorî Salan Sîgortedariyên Li Gor Daxwazê

Sîgortedariyên li gor daxwazê (4/b)	2008	2009	2010	2011	2012	2013	2014*
	235.069	389.791	374.535	270.780	195.557	166.333	129.995

Çavkanî: Îstatîstîkên SGKyê

(*)Meha Mijdarê

Ji hêla din, Qanûna bi hejmar 5510ê, di hin rewşan de tîkiliya sîgortedariya mecbûrî û tîkiliya sîgortedariya li gor daxwazê di heman demê de sepandina wan jî sererast kiriye. Li gor vê, di nav mehekê de kesên ku ji 30 rojê kêmtir tîkiliya wan heye, heke teleb bikin, rojên wan ên ku kêmtir mane ji aliyê şaxên sîgortayên biwade ya dirêj ve derfeta deyndarbûna wek li gor daxwazê aniye. Ev komên ku bi dema qîsmî dixebitin, di bergeha sîgorteya li gor daxwazê de dema wan a pîrîtiyê ku hatiye dayîn, li ser hejmarên rojên dayîna pîrîtiyê ku girêdayî sîgortedariya mecbûrî ve ye tê telêkirin. Encax, demên ku hatine telêkirin di bergeha 4/ayê de (wek karker û SSKyiyên kevî) wek dema sîgortedariyê tê pejirandin. Li gor agahiyên SGK ya Cotmeha 2014ê, di sistemê de 275.248 kes di vê statûyê de ne. Pîrîtiyê sîgorteya li gor daxwazê, di navbera sînora jêr û jor ya qezencê ji pîrîtiyê re esas de (ji 6,5 qat ya sînora jêr), ji %32yê qezencê mehane ya ji pîrîtiyê re esas ji aliyê kesê bisîgorte ve hatiye diyar kirin e. Ji % 20yê vê pîrîtiyê seqetî, pîrîti û mirinê, ji %12yê vê pîrîtiyê nexweşîya gelemperî ava dike. Sîgortedariyên li gor daxwazê ji ber ku pîrîtiyê sîgorteya biwade ya kin nedane, di bergeha sîgorteya biwade ya kin de nayên jimartin.

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE? JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

Ji ber vê, ji sîgortedariyên ku li serê hat xeberdan re pêdaniya kar nekirinê ji nayê dayîn. Ji hêla din, li Tirkîyeyê di piyaseya kedê de kêmbûna radeya destmizê, misogeriya karên berdewamî û têkiliyên xebata yê ku ji bo mirovan re şayan in hema hema tûnebûna van gava were berçav kirin, di vê çarçovê de kesekî ku 10 roj xebitiye, 20 rojê ku maye di bergeha sîgorteya li gor daxwazê de bi dayîne bûyîna sîgorteya tam, ji ber zêdebûna prîman nimkun xuya nake. Bi ser de61-63 emr û 7200 roj ji mecbûriyeta dayîna prîman pê re, kêmbûna pêdaniyên malnişîniyê ku were girtin ji nîşan dide ku berrahiya sîgortedariya li gor daxwazê û şert û mercên piyaseya kedê li hev nake.

III. ŞAXÊN SÎGORTEYA CIVAKÎ

3.1. Şaxên Sîgorteya Biwade ya Kin

Şaxên sîgorteya biwade ya kin, şaxên sîgortayên qezayê kar û nexweşîya pişeyî, nexweşî û sîgorteya dayikî dixê bergeha xwe. Made 3 ya di zagona bi hejmar 5510ê de bi sererastkirina di sala 2013an de hatiye çêkirin, rêjeya prima şaxên sîgorteya biwade ya kin, ji qezenca primê re esas a kesên bisîgorte ji % 2 yê re hatiye derxistin. Vê primê kardêr didin. Vê rêjeyê, di derheqê kêmkirina rêjeya ji % 1.5 an jî bilindkirina rêjeya ji % 2,5an de Civata Wezîran hatiye rayedar kirin. Pêşdetir, di sererastkirinê de ev rêje di navbera rêjeyên ji %1 û ji %6,5 diguheriya, û rayeya diyarkirina rêjeyan jî aidê SGKyê bû.

3.1.1. Sîgortayên Qezaya Kar û Nexweşîya Pişeyî

Qezayên kar ku di kargehan de derdikevin û nexweşiyên pişeyî ku ji ber wêsfên karan diqewimin, di nav jiyana xebatê de pirsgirêkên herî girîng in. Pirsgirêkên bi vî rengî, bi pêşgiriyan tendiristîya karker û ewlehiya civakî ve di pîvekeka girîng de dikarin werin qontrol kirin. Di 'Qanûna Tendiristî û Ewlehiya Kar' a bi hejmar 6331ê ku di tarîxa 30yê Pûşpera 2012an de merî bûye, di kargehan de şertên tenduristî û ewlehiyê hatibe bikevskirin jî, di pey de karesata Somayê û wek mîna wê qezayên kar, ji bo ku ev zagon tenê li ser kaxizê de nemine, pêdiviya venêrînan ku ji aliyê giştî ve bê kirin derxistiye holê. Ji encama wek van bûyeran jî bo ku tenduristîya karker baş bibe, venêrînan wek di nexweşxanê de tedawî kirin û di nav malê de lînêrîna nexweşên giran divê.

Heke prima sîgortayên qezaya kar û nexweşîya pişeyî hatibe dayîn, mesrefên nexweşxanê ya karkerê ji aliyê SGKyê ve tê pergandin. Di rojên ku karker nexebitiye, kardêr destmizê nadê û di vê demê de ji aliyê Saziyê ve ji karker re bi navê 'pêdaniya demi ya kar nedîtîne' de pêdaniyek pereyî tê dayîn. Heke di encama qezaya kar û nexweşîya pişeyî de tenduristîya karkerê bi awayek giran xira bûbe, karker di pişeya xwe de hêza xwe ya ji bo qezenckirina derametê dibe ku wenda bike. Di vê rewşê de ji aliyê Saziyê ve ji karkerê re derameta bikêrnehatina berdewamî tê dayîn.

Di dawî de, heke qezaya kar û nexweşîya pişeyî bi mirina karkerê ve encam bide, bi sifeta xwedî heq, hevser, zarok û kesên nêzik ku bi lînêrîna wan binbare ev tev bi derametekî ve tîr girêdan, pêdaniya cenazeyê tê dayîn û zarokên ku bi derametê re hatine girêdan heke werin çaxa zewacê wê demê pêdaniya zewacê tê dayîn.

Ji ber astengdarî û nexweşiyê ku di encama qezeya kar û nexweşiya pişeyî de derketine holê, ji bo karker heqê derameta bikêrnehatinê ya berdewamî qezenc bike, di pişeya xwe de ji hêza xwe di rêjeya ji %10 kêmbûn, di raporên ku ji heyetên tenduristiyê ya ji aliyê SGKyê ve hatine rayedar kirin de divê hatibe tespît kirin. Encax ji ber ku ev tespît, ne ji aliyê heyetên serbixwe ve, ji aliyê saziyeka girêdayî saziya ku derametê dide ve tê kirin, ev ji hêla objektîfî ve rewşeka biguman derdixe holê.

Divê ev rayeya tespîtê, heyetên ku girêdayî saziya ku derameta hatiyê qezenckirin dê bide neyê dayîn, divê ev raye heyeteka ku objektîfî tevbigere were dayîn û bingeha vê heyetê wek temsîliyeteka beşdar be.

Derameta bikêrnehatina berdewamî, li gor rêjeya zaiyata hêza qezenckirinê ya kesên bisigorte ku di pişeya xwe de tê hesab kirin. Di bikêrnehatina bitemamî de ji kesên bisigorte re, ji %70ê rêjeya qezenca mehaneyê de derametek tê girêdan (md.19)

Di bikêrnehatina qismî ya berdewamî de derameta ku dê were girêdan ji kesên bisigorte re, wek derameta bikêrnehatina temamî tê hesapkirin û di dereceya rêjeya vê bikêrnehatinê de meblaxek tê dayîn. Kesê bisigorte heke muhtacê lênêrîna kesekî din be rêjeya girêdana derametê ji %100 tê sepandin. Helbukî (mülga) di Qanûna Sîgortayên Civakî ya bi hejmat 506ê de “Bisigortayê ku di rewşa qismî berdewamî yan ji bikêrnehatina berdewamî ya bi temamî de ye, heke muhtacê lênêrîna berdewamî ya ji aliyê kesekî din be ev deramet ji % 50 tê zêdekirin” tê rave kirin (md.20).

Di rewşa qezaya kar û nexweşiya pişeyî de pêdaniya bikêrnehatin dema ku were dayîn, di tedawiyên raketine de nîvikiya ji qezenca rojane, di tedawiyên li piyan de ji ji 3/2 ye (md. 18). Ji bo vê yekê hukmê ku di zagona bi hejmar 506ê de cih digire neguheriye.

Jinên Kardêr û Li Ser Hesabê Xwe Dixebitin

Berê di halên qezaya kar û nexweşiya pişeyî de, pêdaniya bikêrnehatina demî ji bo jinên ku li ser hesabê xwe dixebitin re nedihat dayîn. Kesên ku di bergeha 4(b)yê ya zagona bi hejmar 5510ê de dixebitin, di halên qezaya kar û nexweşiya pişeyî de wergirtina pêdaniya bikêrnehatina demî hatiye peydekirin. Encax, ji bo vê, divê hemû deynên derbarê primê, prima sigortaya nexweşiya gelemperî ji tê de hatibe dayîn. Pêdaniya bikêrnehatinê, di dema tedawiya raketine de yan ji piştî tedawiya raketinê de wek pêdiviya vê tedawiyê ji bo dema ku rapora îstirehetê girtine tê dayîn.

3.1.2. Sîgorteya Nexweşiyê

Kesên ji nava bisîgortayên ku di bergeha 4(a)yê de tabîê sîgorteya nexweşiyê ne, ji sedema nexweşiyê dûçarê bikêrnehatinê bin wê demê, di nav sala beriya ji tarîxa destpêkirina bikêrnehatinê de bi şerta agahdarkirina herî hindik 90 roj pîma sîgorteya biwade ya kin, ji roja 3yem a bikêrnehatinê û pêve ji boher rojê pêdaniya bikêrnehatinê ya demî tê dayîn.

Jinên Kardêr û Li Ser Hesabê Xwe Dixebitin

Di zagona bi hejmar 5510ê de di halên nexweşiyê de ji jinên ku li ser hesabê xwe dixebitin re pêdaniya bikêrnehatinê nayê dayîn.

3.1.3. Sîgorteya Dayîkî

Sîgorteya dayîkî bi madeyên 15., 16., 17., 18., 22., 23. û 24. a Qanûna bi hejmar 5510ê ve hatiye bi keyskirin. Ji ber sepanê Sîgorteya Nexweşiya Gelemperî ya ku Qanûna bi hejmar 5510ê ve hatiye bi keyskirin, pêdiviyên ku ji xizmetên tenduristiyê ya ku ji halên dûcanî û dayikiyê derketiyê holê, kesên xwedî sîgorteya gelemperî û kesên ku bi lênêrîna wan binbar di çerçoveya Sîgorteya Nexweşiya Gelemperiyê de tîna dabîn kirin.

Ji Jinên Karker re Heqên ku ji Sîgorteya Dayikiyê Hatine Peyde Kirin

Bi aqda xizmetê re û kesên ku yek an jî ji yekê zêdetir bi kardêran re girêdayî dixebitin û jinên karker ku tabîê statûya sîgortedariya 4(a)yê (SSK ya kevî), di halê zarok anînê de dikevin bergeha sîgorteya dayikiyê. Damezrînên ku di binyeya Saziyên Înfaza Cezayê û girtîgehên de hatine avakirin, bi kesên girtî û mehkûmên bisîgorte ku di kargêh û wek wan ciyan de dixebitin û karkerên ku ji aliyê kardêran ve di kargêhên derveyî welêt ku peyman a ewlehiya civakî tunene de ji bo xebitînê hatine birin jî di bergaha sîgorteya dayîkî de ne.

Halê ku wek dayikiyê hatiye pejirandin û ji tarîxa dûcaniya jinê pêve, heşt haftaneya pêşîn a piştî zayînê, di halê dûcanîbûna pîrejmarî de jî hetta deh haftaneya pêşîn, ji ber halên dûcanîbûn û dayikbûnê bikêrnehatina ku derketiyê holê de, ji bo her rojên ku nexebitiye pêdaniya bikêrnehatina demî ji jinê re tê dayîn û ji bo her zarok jî tenê mexsûsê carekî pêdaniya mijandinê tê dayîn.

Di halê bêamad zarok anînê de, jina bisîgorte beriya zayînê demên ku nikaribuye bixebite bikarneanîbe, bi daxwaza wê û bi pejirandina hekîmê ve 3 hefte beriya zayînê bixebite di vê halê de, ev demên ku xebitiye li ser betlaneya piştî zayînê dikare were îlawe kirin û ji bo wan deman heqê girtina pêdaniya bikêrnehatinê jî peyde ye. Ji bo sûdwegirtina pêdaniya bikêrnehatina demî, di nava salekî ya beriya zayînê de herî hindik 90 roj prîma sîgorteya biwade ya kin divê hatibe dayîn; ji bo sûdwegirtina pêdaniya mijandinê jî şerta 120 roj prîm dayînê heye. Halbûkî di zagona bi hejmar 506ê de, jina bisîgorte ji bo ku pêdaniya mijandinê bistîne tenê 90 roj prîm bidana bes bû. Lewma di aliyê mijandinê de bi zagona nû ve paşketin çêbûye.

Di Qanûna Bi Hejmar 506ê de jinên bisîgorte yên ku heqê pêdaniya mijandinê qezenc kirine lê encax ji ber ku têkiliya wan a bi kargehê re qediyaye sîgorteya wan bidawî bûye, ji vê tarîxê pêve di nava 300 rojê de zarokê wan were dinyayê heqê wan a sûdwegirtina pêdaniya mijandinê di zagona bi hejmar 5510ê de hatiye parastin. Ji bo vê di nav 15 mehê ya beriya tarîxa zayînê de herî hindik 120 roj prîm divê hatibe dayîn.

Di Qanûna bi hejmar 506ê de bi guhertineka 2003yan jina ku deramet an jî mehane distîne, ango jina ku mehaneya malnişîniyê yan jî seqetiyê distîne, heqê sûdwegirtinê ya ji sîgorteya dayikiyê di zagona bi hejmar 5510ê de hatiye parastin¹⁷.

Jinên Kardêr û Li Ser Hesabê Xwe Dixebitin

Bi zagona bi hejmar 5510ê ve, ji jinên li ser hesabê xwe dixebitin re heqê sûdwegirtina sîgorteya dayikiyê hatiye danîn.

Jinên li ser hesabê xwe dixebitin ên tabîê statûya 4(b)yê (Bağ-kuriyên kevn) ku pêşdetir ji sîgorteya dayikiyê sûd wernegirtine jî êdî ji sîgorteya dayikiyê sûd werdigrin.

Jinên bisîgorte ku di vê statûye de ne ji bo ku ji pêdaniya bikêrnehatinê sûd werbigrin; di nava salekî ku beriya zayînê de divê herî hindik 90 roj prîma sîgorteya biwade ya kin bidin; ku ji bo sûdwegirtina pêdaniya mijandinê be, divê 120 roj prîm bidin. Her wiha, hemû deynên bi girêdayî prîman, prîma sîgorteya nexweşîya gelemperî jî tê de divê hatibe dayîn. Ji jinên ku li ser hesabê xwe dixebitin re pêdaniya bikêrnehatinê ya ku di bergeha sîgorteya

17 Ji bo sala 2015an pêdaniya mijandinê wek 112,00 TL hatiye diyar kirin. Di pêdaniya mijandinê de bihurîna demê, ji tarîxa pêkbûna vê heqê pêve 5 sal e. Ji kesên bisîgorte yên ku heqê pêdaniya mijandinê qezenc kirin e re, ji ser Sistema Parvekirina Nasnameyê agahiyên di derheqê zarokên ku ji dayîkbûne de tîn tespît kirin û bi vê awayê bêyî şerta teleb kirinê pêdaniya mijandinê tê dayîn. Encax, ji ber agahiyên ku neketibin Sistema SGKyê li hemberê wek rewşên nedayîna pêdaniyan de, li rêvebirîtiya bajarê / navendên SGKyê re serîlêdana jinan girîng e. Ji bo wê divê daxwaznameyeka telebê û rapora zayînê hebe.

dayikiyê de were dayîn, di tedawiya raketinê de nivê qezenca rojaneyê, di tedawiyên li piyan de jî ji 3/2 yê qezenca rojaneyê ye.

Mijara girîng ewe ku jinên ku li ser hesabê xwe dixebitin bala xwe bidinê, ji bo ku heqê pêdaniya bikêrnehatinê qezenc bikin, divê demên ku betlaneya zayînê de nexebitîne ji SGKyê re agahdar kiribin. Heke agahdar kirin pêk nehatibe, ji ber ku wek xebitîne werin xuya kirin, winda kirina ev heqê wan dabaş e.

Jinên Bermalî Ku DiTu Karekî De Naxebitin û Hevserê Wan Di Bergeha 4 (a) yan jî 4 (b) yê De Dixebitin

Di zagona bi hejmar 506ê de ya heyî û jinên bermalî ku di tu karekî de naxebitin lê hevserê wan bi SSKyê ne, ji ber hevserên xwe heqê wan a sûdwegirtina sîgorteya dayikiyê didome. Ji guhertinan yek a girêdayî sîgorteya dayikiyê ya di zagona bi hejmar 5510ê de ku di zagona bi hejmar 506ê de tune ye, jinên bermalî ku di tu karekî de naxebitin û hevserê wan di statûya 4 (b)yê de dixebitin re, heqê sûdwegirtina ji sîgorteya dayikiyê hatiye anîn.

Ji hevserên jinên ku tu karekî de naxebitin yê di bergeha 4 (a)yê de tabîê van statûyan de dixebitin ji bo wan, divê di nava sala beriya zayînê de herî hindik 120 roj prîma ji şaxên sîgorteya biwade ya kin hatibe dayîn, ji bo kesên di bergeha 4 (b)yê dixebitin re jî di nava sala beriya zayînê de herî hindik 120 roj prîma ji şaxên sîgortayên biwade ya kin hatibe dayîn û hemû deynên bi girêdayî prîman ve ne, prîma sîgorteya nexweşîya gelemperî jî tê de divê hatibe dayîn (md.16).

Bi zagona bi hejmar 5510ê ve, mêrê ji ber xwebatên xwe deramet an jî mehane distîne, ango mehaneya malnişîniyê yan jî seqetiyê distîne hevsera wî ya nebisîgorte ye ji heqê sûdwegirtina dayikiyê heye. Sigortedariyên ku di vê statûyê de ne di nava sala beriya zayînê de herî hindik 120 roj prîma ji şaxên sîgortayên biwade ya kin hatibe dayîn û hemû deynên bi girêdayî prîman ve ne, prîma sîgorteya nexweşîya gelemperî jî tê de divê hatibe dayîn. Encax, jinên ku ji ber hevserên xwe ji sîgorteya dayikiyê sûd werdigrin, ji ber ku ew ne di pozîsyona bisîgorte ya çalak de ne pêdaniya bikêrnehatina demî nikarin bistînin.

3.2. Şaxên Sîgorteya Biwade ya Dirêj

Di bergeha vê şaxa sîgortayê de sîgorteya pîrîtiyê û mirinê cih hatiye dayîn.

3.2.1. Sîgorteya Pîrîtiyê

Sîgorteya pîrîtiyê ji şaxeka sîgortayê ye ku ji ber encama pêşketina emrê kêmbûna qeweta xebatê ya kesên bisîgorte ku dahata wan winda bûye, ji bo peyde kirina debara wan ava bû ye.

Ji sîgorteya pîrîtiyê;

- Mehaneya pîrîtiyê tê girêdan û
- Dayîna tevahî tê kirin.

Di Qanûna bi hejmar 5510ê de şertên qezenckirina heqê mehaneya ji sîgorteya pîrîtiyê li gorî şertên gelemperî û taybet ve hatine diyar kirin. Şertên gelemperî, li gorî qanûna meriyetê de kesê bisîgorte ku di tarîxa hê nû bisîgorte bû ye de, li gorî emir, sîgortedarî û hejmara dayîna rojên primê hatine diyar kirin; şertên taybet, seqetiyên kesên bisîgorte û rêjeya windabûyîna hêza xebitînê wek van rewşên taybet tên diyar kirin.

1) Şertên Gelemperî

Şertên gelemperî ya qezenckirina heqê mehaneya ji sîgorteya pîrîtiyê;

- a) Beriya tarîxa 08.09.1999ê (hariç),
- b) Di navbera tarîxên 08.09.1999ê (tê de) û 30.04.2008ê (tê de) de,
- c) Piştîdi tarîxa 30.04.2008ê (xaric) de,

ji bo kesên bisîgorte re, bi sê awayên cuda ve tê vekolandin.

Destpêka sîgortayê beriya di tarîxa 08.09.1999ê de be û kesên ku piştî tarîxa 01.10.2008ê de malnişîni bû ne mehaneya wan; ji bo beriya 08.09.1999ê, heyama 08.09.1999 - 30.04.2008ê û heyama piştî 01.10.2008ê ve ji têheva mehaneyên qismî ku cuda cuda hatine hesabkirin pêk tê.

Rewşa Malnîşiniyê ya Jinên Bisîgorte ku bi 4(a)ya ku Bi Girêdayî Kardêrekî re Bi Aqda Xizmetê ve Dixebitin

Di girêdana mehaneya pîrîtiyê ya kesên bi aqda xizmetê ve dixebitin de, derbasdarbûyîna kîjan hikmên qanûnê, li gorî tarîxa cara pêşîn sigortebûyîna, guhêrk nîşan dide.

1. Jinên Ku Beriya Di Tarîxa 08.09.1999ê (Tê de) De Bisîgorte BûNe

a) Jinên ku ji tarîxa 08.09.1999ê ve dema sigortedariya 18 salaneya xwe tije kirine,

- 50 salên xwe tije kiribe herî hindik 5000 roj an jî

- 50 salên xwe tije kiribe, ji 15 salê pê ve bisîgorte be û herî hindik 3600 roj an jî,

- 50 salên xwe tije nekiribe û pê re ji 20 sal pê ve bisîgorte be û herî hindik divê 5000 roj prîma sigorteya seqetî, pîrîtî û mirinê hatibe dayîn, bi van şertan ku hatibin cih, heqê mehaneya pîrîtiyê qezenc dikin.

b) Kesên bisîgorte ku di tarîxa 08.09.1999ê de van şertan neanîbin cih, li gorî mudeyên di tarîxa 23.05.2002yê de, di tabloya li jêr de ku hatiye diyar kirin, di halê anîna şertên mudeya herî hindik ya sigortedariyê, hejmara rojên emir û prîm dayîna de heqê qezenckirina mehaneya pîrîtiyê hatiye derpêş kirin.

c) Kesên ku ev şertên di tarîxa 23.05.2002yê de hatine derpêş kirin neanîbin cih, van şertan di tabloya jêrîn de di kîjan navberê tarîxê de binin cih di wê emrê de heqê mehaneyê qezenc dikin.

- Jinên ku di navbera tarîxên 24.05.2002yê û 23.05.2005ê de anîne cih 52,

- Jinên ku di navbera tarîxên 24.05.2005ê û 23.05.2008ê de anîne cih 54,

- Jinên ku di navbera tarîxên 24.05.2008ê û 23.05.2011ê de anîne cih 56,

- Jinên ku piştî tarîxa 24.05.2011ê de anîne cih heke 58 salî emrê xwe tije kiribin, heqê mehaneya pîrîtiyê qezenc dikin.

LI TIRKÎYÊYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
 JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
 VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

2. Di navbera tarîxên 08.09.1999 - 30.04.2008ê de Jinên Bisîgorte ku cara yekem bi aqda xizmetê ve bi dest xebitîne bisîgorte hatine jimartin;

- 58 salî tije kirin û divê 7000 roj prîma sîgorteya seqetî, pîrîtî û mirinê hatibe dayîn an jî,
- 58 salî tije kirin û ji 25 salî pê ve bisîgorte bûyîn û herî hindik 4500 roj prîma sîgorteya seqetî, pîrîtî û mirinê hatibe dayîn,

Bi cih anîna ji van şertan yekê dikarin ji mehaneya pîrîtîyê sûd werbigrin.

3. Piştî tarîxa 30.4.2008ê de Jinên bisîgorte ku cara yekem bi aqda xizmetê ve bi dest xebitîne bisîgorte hatine jimartin; Li gorî şertên Qanûna bi hejmar 5510ê ve hatiye diyar kirin dê heqê mehaneya pîrîtîyê qezenc bikin. Li gorî Qanûna bi hejmar 5510ê;

- Jinên bisîgorte ku heya sala 2036ê 58 salê xwe tije kiribin û 7200 roj prîma sîgorteya seqetî, pîrîtî û mirinê didin,
- Piştî sala 2036an de, di halê şerta 7200 roj hejmara prîma sîgorteya seqetî, pîrîtî û mirinê dayîne de jî, di navbera tarîxa şerta rojê ku anîne cih de, jinên bisîgorte ku sînorê temena xwe tije kirine dê heqê mehaneya pîrîtîyê qezenc bikin.

Tablo 3: Li Gorî Qanûna Bi Hejmar 5510ê, Li Gorî Tarîxa Şerta Prîm û Rojê Ku Hatiye Cih, Tabloya Emrê Malnişîniyê Nişan Dide

Qanûna Têkildar	Ji bo Sîgortedariyên 4(a)yê ku Tabîê Bi Aqda Xizmetê ve Dixebitin, Tarîxa ku Şerta 7200 Roj Prîmdayîne Pêk Hatiye	Telebê de Pêdivî Herî Hindik	
		Emir	
		Jin	Mer
5510	01.05.2008 - 31.12.2035	58	60
	01.01.2036 - 31.12.2037	59	61
	01.01.2038 - 31.12.2039	60	62
	01.01.2040 - 31.12.2041	61	63
	01.01.2042 - 31.12.2043	62	64

5510	01.01.2044 – 31.12.2045	63	65
	01.01.2046 – 31.12.2047	64	65
	01.01.2048	65	65

Çavkanî: SGK, http://www.sgk.gov.tr/wps/portal/tr/Emeklilik/yaslilik_ayligi/4a_hizmet_akdi

Weka ku di Tablo 2yê de tê dîtin, bi vê bi rêkûpêkkirinê re ji sala 2048an ve emrê heq qezenckirina mehaneya pîrîtîyê dê beranber be û ji bo jin û mêr re emir 65 dê bibe.

Rewşa Malnişîniya Jinên Bisîgorte ya 4 (b)yê Ku Li Ser Navê Xwe û Li Ser Hesabê Xwe Serbixwe Dixebitin

1. Jinên 4 (b)yî Ku Beriya Di Taîrîxa 08.09.1999ê (tê de) De Bisîgorte Bûne

a) Jinên bisîgorte ku ji tarîxa 01.10.1999ê pêve heqê mehaneyê qezenc kirine û yên ku ji heq qezenckirina wan re tam 2 sal an jî kêmtir maye;

- Tam 20 sal prîm dayîn an jî
- 50 salî bûn û tam 15 sal prîm dayîn,

Ji van şertan yekê binin cih dikarin ji mehaneya pîrîtîyê sûd werbigrin. Sîgortedariyên 4 (b)yê di tarîxa ku teleba mehaneya pîrîtîyê bûne de, divê deynên primê û girêdayî primê nema be.

b) Heq qezeckirina girêdana mehaneyê ya jinên bisîgorte re ji tarîxa 01.10.1999ê pêve heke ji 2 salî zêdetir dem mabe û yên ku ji tarîxa 01.6.2002yê pêve tam 20 sal mudeya prîm dayînê tije kirine re şertên mehaneya pîrîtîyê wek li gorî tabîê qeydeyên pîledar ya derbase ve hatine diyar kirin.

c) Li Gorî Qanûna bi hejmar 1479ê, fiqreya sêyemîn ya madeya 10. a demborî ve Jinên Bisîgorte ku heqê mehaneyê qezenc kirine, ji tarîxa 01.10.1999ê pêve dabîn kirina şerta 50 salîbûnê pê re, ji bo tam 15 salî tije kirine re heke ji 2 salî zêdetir dem mabe, ji bo girtina mehaneyamalnişîniyê dîsa tîn xistin nava heyama pîledar a derbase.

2. Di navbera tarîxên 08.09.1999 (tê de) û 30.04.2008ê (tê de) de jinên bisîgorte ku 4 (b) yî ne Ji tarîxa 08.09.1999ê heya tarîxa 30.04.2008ê de jinên ku hê nû cara yekem bisîgorte hatine jimartin;

- 58 salî tije kiribe û 25 tam sal dayîna prîma sîgortayê kiribe yan jî,
- 60 salî tije kiribe û herî hindik 15 tam sal prîm dayîn

Ji van şertan yekê anîbin cih dikarin ji mehaneya pîrîtiyê sûd werbigrin.

3. Piştî tarîxa 30.04.2008ê de Jinên 4 (b) yî ku bisîgorte bûne

Piştî tarîxa 30.04.2008ê de kesên ku bisîgorte hatine jimartin, di qezenckirina wana heqê mehaneya pîrîtiyê de sertên ku bi Qanûna bi hejmar 5510ê ve hatine diyar kirin dê derbasdar be. Li Gorî Qanûna bi hejmar 5510ê;

- Jinên bisîgorte ku heta sala 2036an 58 salî xwe tije kirine û 9000 roj prîma sîgortayên seqetî, pîrîtî û mirinê dane û,
- Piştî sala 2036an de, di halê şerta 9000 roj hejmara prîma sîgorteya seqetî, pîrîtî û mirinê dayîne de jî, di navbera tarîxa şerta rojê ku anîne cih de bi esas girtina sînorê temenê, dikarin heqê mehaneya pîrîtiyê qezenc bikin.

2. Şertên Taybet

Bi Qanûna bi hejmar 5510ê ve, kesên wek bisîgorte beriya ku dest bi xebitîne seqet bûne, rêjeya hêza xebitîne ya winda di bin ji % 60î de ne, yên ku zû pîr bû ne, bisîgorteyên ku di karên madenê de dixebitin û jinên bisîgorte ku zarokê wan bigiranî astengdar in wek muhtacê lînêrîna kesekî be hebin ji wan re di şertên hêsantir de derfeta malnîşînîbûyîne hatiye peydekirin. Li jêr rewşa sîgortedariya jinên ku xwedî zarokên bigiranî astengdar in tê behs kirin.

Jinên Bisîgorte ku Xwedî Zarokên Bigiranî Astengdar in

Ji jinên bisîgorte ku taleba mehaneya pîrîtiyê kirine ji wan yên xwedî zarokên ku mihtacê lînêrîna kesekî dijîn hene, piştî tarîxa ku ev qanûn merî bûye de ji hejmara rojên dayîna prîmê yên derbasbûyî ji 1/4 î, li ser tevahiya hejmara

rojên prîm dayînê re tê îlawe kirin û ev demên ku hatine îlawe kirin, ji sînorê temenê ya malnişîniyê hikmê daxistina wî hatiye anîn.

Li gor vê bi rûpêkkirinê demên ku li ser demên sîgortedariya jinê de dê were îlawe kirin;

- Li gorî destpêkirina sîgortedariya jina bisîgorte, beriya yan jî piştî tarîxa merîyeta Qanûna bi hejmar 5510ê
- Li gorî tarîxa zayîna zarokê,
- Di halê mirinê de li gorî tarîxa mirinê,
- Li gorî tarîxa despêkirin û qedandina halê kesên bigiranî astengdar ku bi berdewamî muhtacê lênêrîna kesekî din in,
- Li gorî rewşa zewicîn an nezewicîna zarokê,
- Heke jina bisîgorte di rewşa hev berdand de be û welayeta zarokê li ser jinê be yan ne be,
- Heke jina sîgortakirî dev ji hevserê xwe berda be welayeta zarokê li ser wê ye yan na,
- Li gor ku zarok ji aliyê jina sîgortekirî ve hatiye zirkur/ewladkirin yan na,
- Li gorî rewşa xwedîbûna ji yekî zêdetir zarokên bigiranî astengdarê ku biberdewamî muhtacê lênêrîna kesekî din in,
- Zarokê ku bigiranî astengdar e, li gorî hikmên Qanûna Xizmetên Civakî û Saziya Hêvişandina Zarokê ji xizmetên parastin, lênihêrîn û rehabilitasyonê wek mizedar yan jî bêmize, biberdewamî û şevîn jê sûd werdigre an nagire, tê diyarkirin.

Ev mudeya îlawe ku ji bo jinên sîgortakirî re hatiye dayîn, heta jiyîna zarokê ku bigiranî astengdar e ku biberdewamî muhtacê lênêrîna kesekî din e bijî derbasdar e. Di halê mirina zarokê de, ji tarîxa mirina zarokê pêve ji ber xebatên ku derbasbûyî ji jina sîgortakirî re xizmeteka îlawe nayê dayîn. Rewşa ewlatbûyîna zarokê ji sûdwerigirtina vê mafê

naguherîne.

Jina sîgortakirî bixwe yan jî bi hevserê xwe re zarokê ku wek zirkur/zirkêç hilgirtine ba xwe, heke bê tespîtkirin ku ew zarokê ku astengdariya wê/wî giran ku biberdewamî muhtacê lênêrîna kesekî din e, di vê halê de jina sîgortakirî ji vê sepanê tê hevildarkirin.

Encax jina bisîgortekirî heke ji yekî zêdetir xwediyê zarokê ku bigiranî astengdar e ku biberdewamî muhtacê lênêrîna kesekî dinin be, di vê rewşê de jina sîgortakirî tenê ji bo yekî dikare ji vê mafê sûd werbigre. Di vê rewşê de SGK, li gorî rewşa zarokê ku tarîxa astengdariya wî kevtir e, dest bi xizmeteka îlawe dike. Ji ber zarokên din ên astengdar ji jina sîgortakirî re mudeya îlawe ya xizmetê nayê zêdekirin.

▶ Di halê hevberdanê ya jina sîgortakirî de, zarokê astegdarê giran ku biberdewamî muhtacê lênêrîna kesekî din e welayeta wî/wê heke bidin kesekî din di vê halê de ji tarîxa dayîna welayetê pê ve ji ber xebatên ku derbasbûyî ji jina sîgortakirî re xizmeteka îlawe nayê dayîn.

Ev mafê ku ji bo jinên xwedî zarokên bi giranî astengdar e re hatiye pejirandin him erênî ye him jî di sepanê de hin kêmasiyan û helwestên cihêtiyê jî di nava xwe de dihewîne. Beriya her tiştî, mewzûata ewlehiya civakîyê, bergeha ku di nav civakê de hatiye pejirandin re wek rastênhev, pirsgirêka lênêrîne wek binbaritiya jinê hê jî tê dîtin. Û wek dûyemîn, di halê ji yekî zêdetir hebûna zarokên astegdarê giran de, ji aliyê jina sîgortakirî ve ji vê sepanê sûdwegirtina tenê ji bo zarokê, bi armanca vê bi rêkûpêkkirinê re dîtewîşe. Armanca bi rêkûpêkkirinê, ji bo jinên ku di vê halê de ne re bi cudakeriyek pozîtîf ve dabînkirina malnişîniyeka zû be, bêyî endîşeya zêdebûna lêçûna SGKyê, ji bo hemû zarokên bigiranî astengdar re ji jina sîgortakirî re mudeya îlawe ya xizmetê divê were dayîn.

Di sepanê de mixrikiyeka din jî, li gorî hukmê Qanûna Saziya Stargeha Zarok û Xizmetên Civakî ev zarokê ku bigiranî astengdar e ji xizmetên hêvişandina wek biberdewamî û şevin, lênihêrîn û rehebîltasyonê di halê sûdwegirtinê mizedar an jî bêmime de, rewşa sûdwegirtina ji mafê malnişîniya zû ya jina sîgortakirî ye. Xizmetên lênihêrîn û rehebîltasyonê, ji hemû sepanên din wek serbixwe, xizmetên xweşguzarî ya esas ku têne bihur, ji bo hemû kesên astengdar re were dayîn. Mafê malnişîniyê ku jina sîgortakirî ya xwedî zarokê bigiranî astengdar e re hatiye nasîn divê ji van xizmetan wek serbixwe were dîtin.



3.2.2. Sîgorteya Mirinê

Armanca vê şaxa sîgortayê, bi mirina kesê bisîgorte ve, çareserkirina windabûyinên derametê ku hatiye serê hevser, zarok û dê û bavê ku di pozisyona xwedîheq de ne ye.

- ▶ Alîkariyên ku di jêr de hatine diyar kirin, ji sîgorteya mirinê tê peyde kirin.
 - Girêdana mehaneya mirinê
 - Dayîna pêdaniya bitevahî ya mirinê
- ▶
 - Dayîna pêdaniya zewacê
 - Dayîna pêdaniya cinazeyê

Kesên bisîgorte ku piştî tarixa meriyeta Qanûna bi hejmar 5510ê de mirine ji bo kesên xwedîheq re mehaneya mirinê were girêdan;

- Ji bo sîgortedariyên ku di bergeha 4b û 4cyê de ne, herî hindik 1800 roj prîma sîgorteya MYÖyê,
- Ji bo sîgortedariyên ku di bergeha 4ayê de ne, her cûre mudeyên deyndariyê xaric herî hindik ji 5 salê pê ve bisîgorte bin û 900 roj MYÖyê divê agahdar kiribin.

Wek dîtîna ku cudatîyên sîgortedariyên bergehên di navbera xebatkaran de cihêtiyek girîng bi xwe re tîne.

Ji Xwedîheqên Sîgortedariyê Ku Mirî Re Şertên Girêdana Mehaneyê

Hevser, zarok, dê û bavê ku ji mehaneya mirinê sûd werdigrin, paya wan a mehaneyê ji hev cûda ne. Tevahiya mehaneya ku ji hevser û zarokan re hatiye girêdan, heke ji mehaneya sîgortedariyê derbas bibe, wê demê mehaneya wan bi paya wan re wek birêje tê daxistin.

a) Ji Hevserê re Şertên Girêdana Mehaneyê

Bi mirina sîgortedarî ve ji bo girêdana mehaneya hevsera ku bî maye re, divê di tarîxa mirinê de hevser bisîgorte be û tîkiliya zewaca fermî hebe. Bi nikaha dînî ve zewicîna wan an jî bi hev re jiyîna wan wesfa xwedîheqbûnê nade

qezenckirin.

Xebitîna hevserê ya li gor tabîê Qanûna bi hejmar 5510ê ve yan jî tabîê mewzûata welatê biyanî ve , yan jî ji van deran girtina derametê yan jî girêdana mehaneyê re ne asteng e.

Zelîxa ya ku ji hevserê xwe yê ku miriyê mehane distîne, di heman demê de, wek bêsigorte bi tam demî zarok dinêre.

Ji tîrsa birîna mehaneya ku ji hevserê xwwe distîne, teleba sigortekirinê ya xwediyê malê red dike. A rastî, Zelîxa dikare him ji hevserê xwe yê mirî girtinamahaneyê bidomîne û him jî wek sigortadarî bixebite jî. Wek bisigorte xebitîna wê ji birîna mehaneyê re ne asteng e.

Zewicîna hevserê wesfa xwedîheqbûnê daxistîne û mehane jî tê birin. Ji hêla din, ji bo ku mehaneya ku ji ber mirina hevserê xwe distîne neyê birin, bi hevserê din re bêyî têkiliya zewacê ve bi hev re jiyîna wan were tespît kirin, mehaneyên ku standine îptal kirin û pêdaniyên ku nelicîh hatiye dayîn paş ve tê tehsîl kirin. Wek tê dîtin ku mecbûriyeta nikâha fermî, bi nikâha dînî yan jî kesên ku bi hev re dijîn dûçarê qeyba hin mafan dibin. Ji hêla din, zêhniyeta jinê bi pêwendîya zewacê ve ji mêrê re bendewar kirin dabaş e. Keda jina ku ji mêrê xwe re didin tê paşçavkirin û midaxeleyê jiyana wan a taybet tê kirin.

Ji hevserê bî ya kesê sigortakirî re mehaneya mirinê ku hatiye hesabkirin ji % 50yê wî; ji hevserê bî ya ku zarokê wê tune ye û mehane hatibe girêdan an jî ji ber sigortedariya xwe deramet an jî mehane nehatibe girêdan di vê halê de di rêjeya ji % 75 de mehane tê girêdan.

Heke hevser nexebite û ji ber sigortedariya xwe deramet yan jî mehane negirtibe û di heman demê de zarokê wê ku xwedîheq in jî tune be paya wê ya mehaneya mirinê ji % 75 dibe.

Heke hevser ji ber xebatên xwe mehane bigire paya wê ya mehaneya mirinê ji % 50 dibe.

Heke hevser nexebite û ji ber sigortadariya xwe deramet an jî mehane nebistîne encax zarokê wê ya ku xwedîheq e mehane bistîne paya wê ya mehaneya mirinê ji % 50 dibe.

Di beriya Qanûna bi hejmar 5510ê de ji jina ku du mêrê wê jî miriye re, mêrên wê di saziyên ewlehiyê yên cuda de xebitîbin jî, ji her du mêrên wê jî mehane dihat girêdan. Halbûkî bi vê Qanûnê re mehaneye ku hatibe tercih kirin, tê girêdan. Ji qeyba heq yeka din jî ji aliyê jinên ku dixebitin ve tê jiyîn. Di beriya qanûnê de jinek bixebite jî ji %75 mehaneya hevserê xwe dikaribû bistîne, bi Qanûn re rêjeya ku dikarin bistînin a jinên ku dixebitin heta %50 hatiye daxistin.

b) Şertên Girêdana Mehaneyê Ya Ji Zarokan Re

Di girêdana mehaneya mirinê de, bi zarokên ku di nav pêwendîya zewacê de hatine dinyayê û kesê sigortakirî û ji aliyê hevserê xwe, bi hev re zarokên ku zirkur/zirkêç girtine ba xwe, zarokên nasbûyî yan jî neseba wî/wê hatiye bi rêkûpêkkirin yaxut zarokên bavîtiya wan bi hukmê re hatine girêdan jî wek xwedîheq tî jîmartin. Ji hêla şertên qezenckirina mehaneya mirinê ve ji bo zarokan şerta hevpar; “Di bergeha Qanûna bi hejmar 5510ê de yan jî di mewzûata welateka biyanî de nexebitîn an jî ji ber sigortadariya xwe deramet yan jî mehane nehatibe girêdan.”

Di derbarê zarokan de şert û mercên din, li gor keç û kurbûna zarokê yan jî li gor seqetiyê cudatîyan nişan dide.

Zarokên Kur

Ji zarokên kur re jî bo ku mehane were girêdan, heke ne xwendekar be 18, hîndekariya navîn de be 20, hîndekariya bilind de jî divê 25 salê xwe tije kiribe. Heke hîndekariya navîn 20, hîndekariya bilind jî beriya 25 salê hatibe qedandin di vê halê de li benda van temenan nayê sekinin û mehaneya mirinê tê birîn.



Zarokên Keç

Emrê zarokên keç, çî bibe bila bibe heke nezewicî bin, zewicî û pê re piştî hevberda be yan jî bî mabe, di van

rewşan de mehaneya mirinê tê girêdan. Di nav şertên xwedîheqbûyîna zarokên keç de, şerta xwendekariyê ya heta emrên diyarkirî nayê gerîn. Mehaneya mirinê ya ku zarokên keç ji dê û bavê xwe digrin, gava dizewicin an jî wek bisîgorte dest bi xebitîna bikin wê demê ev mehane tê birîn. Rewşa zewac û xebatîna gava diqede dîsa heqê girtina mehaneya mirinê qezenc dîkin. Heke ji hevserê xwe hevberdan pêk bibe û dîsa jî bi hevserê xwe re bi fiilî jiyîna zarokên keç were tespît kirin wê demê mehaneyên mirinê tê birîn û pêdaniyên ku di ser de hatiye dayîn jê tê stendin.

Di xebata Alper vd.yê de (2015)¹⁸ zarokên keç mehaneya mirinê ya ku ji ser dê û bavê xwe distînin, di rewşên zewicîn û xebitîna de birîna mehaneyê, van jinan, an jî xebata bêqeyd re sewk dike yan jî di mijara jiyana xebatê de wan dilsar dike gotiye.

Ji bo ku pêşî lê were girtin ev rewşa ku ji aliyê jinan ve di mewzûatê de erênî, encax di pratîkê de wek neyînî tê jimartin, zewicîn yan jî xebitîn, wek di sîgortedariya jinan de pêk tê, divê ji birîna mehaneya mirinê re nebe asteng.

Zarokên Seqet

Mehane mirinê, bi biryara Heyeta Saziya Tenduristiyê ve ji zarokên keç û kur ên ku hêza wan a karê ji %60î wînda kiribin re tê girêdan. Di zarokên seqet de wesfên emir û xwendekariyê û şerta nezewicibûnê nayê gerîn.

Zarokên di weziyeta xwedîheqbûnê ya sîgortedariya mirîye ne re (kur, keç û zarokên seqet) rêjeya mehaneya mirinê ku hatiye girêdan, ji bo her zarokê ji %25 e.

Encax, bi mirina sîgortedariyê ve zarokên ku him bê dê him jî bê bav mane re mehaneya ku were girêdan rêjeya wî ji %50 ye.

c) Dê û Bav

Ji bo dê û bav re mehane were girêdan;

18 Alper Y. vd., (2015), “Mehaneyên ku ji Sîgorteya Mirinê hatiye Girêdan Bandora Wî Ya Li Ser Îstîhdam û Beşdarbûna Zarokên Keç Ya Ji Hêza Karê Re”, Kovara Aboriya Ramyariyê û Pêşlêgerîna Rêberiyê, Aboriya Xebatê Ya 16. û Hejmara Taybet A Kongireya Têkiliyên Pişesaziyê.

- Derameta wan ji meblaxa mizeya asgariyê kêmtir be, (di navbera dê û bav de têkiliya zewacê hebe di vê nirxandinê de rewşa dê jî bav jî bi hev re tê nirxandin.)
- Derameta ku ji zarokê din heq qezenc kirine û mehaneyan wek xaric, deramet û mehane nehatibe girêdan, (deramet û mehaneyên dê û bavê ji hev cuda tên nirxandin.)
- Ji hevser û zarokên xwedîheq de paya ku mayî hebe (di halê li ser 65 salê de şerta paya mayînê nayê gerîn.) ev şertan tê gerîn.

Di tarîxa mirina sîgortakirî de yan jî piştê ji hevser û zarokên wî re tevahiya mehaneyên ku ji wan re divê were girêdan, ji mehaneya mirinê; kêmtir be, para ku mayî, ji dê û bavê wî yê ku heqê mehaneya mirinê qezenc kirine wek payen yeksan tê dayîn.

Encax, tevahiya paya mehaneya dê û bavê ji % 25ê derbas nake. Ji ber vê, gava ji dê û bav re mehane tê girêdan ji % 25 rêjeya wî tê du par kirin, paya wan a mehaneyê bi awayê %12,5 tê diyar kirin.

Heke emrê dê û bavê li ser 65 salî be bêyî nêrîna paya mayînê mehane tê girêdan.

Dayîna Pêdaniya Zewacê

Li gor Qanûna bi hejmar 5510ê, ji ber zewicînê deramet û mehaneyên ku divê were birîn ên zarokên keç, di halê zewicîn û daxwaz kirinê de, deramet û mehaneya ku distînin meblaxa wî ya du salaneyê ji bo carekê re mexsûs pêdaniya zewacê pêşîn tê dayîn.

Ayla'yê ji ser bavê xwe 200 TL mehane digre lê gava zewicî ev mehaneya ku distîne meblaxa wî ya du salaneyê wek pêdaniya zewacê tê dayîn.

Pêdaniya Zewacê: $200 \times 24 \text{ meh} = 4800 \text{ TL}$.

Ev mêjera ku hatiye hesabkirin ji bo carekê re mexsûs wek pêdaniya zewacê tê dayîn. Ayla'ya ku pêdaniya zewacê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

distîne heke di nava du salê de ji hevserê xwe hevberde, ji bo ku mehaneya mirinê ya ku ji ser bavê wê hatibû girêdan dîsa bistîne, divê li benda mudeya du salaneyê tije bibe be. Encax, yên ku di vê rewşê de ne, heta dawiya vê mudeyê wek sîgortedariyê tenduristiya gelemperî tîn jimartin.

IV. SÎGORTEYA TENDURISTIYA GELEMPERÎ (GSS)

Di zagona bi hejmar 5510ê de ku hatiye bi rêkûpêkkirin (md.60.) û Sigorteya Tenduristîya Gelemperî ku tê vezanîn cara yekem hemû nifusê bi mecbûrî dê bixe bergeha xwe, li pey hin gengeşiyên dirêj de, di tarîxa 01.01.2012an de ketiye meriyê.

Kesên tabîê statûyên 4 (a), 4 (b) ve 4 (c)yê dixebitin û kesên ku bi daxwaza xwe bisigorte bû ne jiberxwe Sigortedariyê Tenduristîya Gelemperî tînin jimartin. Herwiha kesên zarok, astengdar, jin û pîran ku di sazîyên girêdayê Wezaretê Polîtîkayên Malbat û Civakî de ne ew tev ji ber xwe ve di bergeha STGyê de ne. Ji ber ku jina eleqedar dike jî, di navbera kesên ku jiberxwe ve di bergeha STGyê de ne de “Li gorî hukmên Qanûna Parastina Malbatê û Pêşilêgirtina Tundiya Li Hember Jinê de kesên ku di derbarê wê de biryara tedbîrê a piştewan hatiye dayîn” jî hene.

Herwiha, bêtî respîta derametê zarokên ku 18 salî tije nekirine sigortedariya wan a tenduristîya gelemperî tune be yan jî bi lînerîna kesekî ve ne binbar bin, di bergeha GSSê de ne.

Prîma sigortedariya tenduristîya gelemperî, ji bo kesên tabîê şaxên sigorteya biwade ya kin û dirêj in re, ji %12,5ê ji qezenca primê re esas e. Ji %5ê vê primê ji aliyê sigortedarî ve, ji %7,5ê wî jî ji aliyê kardêr ve tê dayîn.

Kesên ku statûya 4 (a) yê sigortedariyê tenduristîya gelemperî tînin jimartin, ji tarîxa ku sigortedariya mecbûrî bidawî dibe pêve bi mudeta 10 rojê ve ji sigortedariya tenduristîya gelemperîyê dikarin sûd werbigrin.

Ji tarîxaku wesfa sigortedariya 4 (a)yê wînda kirine paş ve di nav salekî de heke sigortedariya wan a mecbûrî hebe, ji tarîxa ku wesfa sigortedariyê wînda kirine pê ve bi mudeta 90 rojê ve kesên ku bi lînerîna wan binbarin jî tê de dikarin ji xizmetên tenduristîyê sûd werbigrin.

Kesên ku dervehiya vê statûya ku me jimart de ne, encax derameta xaneyê meblaxa mehane ya ji serane re heke were îspat kirin ku ji sisê yek a mizeya asgariyê kêmtir e, bêtî dayîna prîma STGyê dikarin bibin STGyî. Metodên têtê ku ji aliyê sazûmanê ve dê were diyar kirin û bi bikaranîna agahîyan ve kesên ku werin respîtîkirin pênasa meblaxa mehane yê ya serane gava tê kirin “lêçûnên wê/wî, guhêzbar û neguhêzbar û heqên ku ji van pêk tînin bi pax girtinê” tê gotin. Ji ber vê sedemê, di nav xaneyê de tu derametaka wê/wî tune be jî, kesên ku derameta wan ji mizeya asgariyê serane ji sisê yekê zêdetir be, li hemberî deynên STGyê dimînin.

Di sîstema Sîgorteya Tenduristiya Gelemerî de pênasa kesê sîgotedariya tenduristiya gelemeriyê û pênasa kesên ku bi lînêrîna wê/wî binbare jî hatiye anîn.

Kesên ku tu sîgorteya wan tune ye yan jî li gor daxwaza xwe jî bisîgorte nebû ne, herwiha ji ber sîgotedariya xwe deramet an jî mehane nagrin, dikevin bergeha kesê ku di bin binbariya kesê sîgotedariya tenduristiya gelemerî de ye. Li gor vê, hevserê sîgotedariya tenduristiya gelemeriyê; 18 salê xwe, di halê perwerde dîtina dibistana amedeyîyê û di tayê wî de 20 salê xwe, di halê hindekariya bilind de 25 salê xwe tije nekiribe û zarokên xwe yê nezewicî re û bêyî nihêrtina emrê li gor vê Qanûnê seqetiya zarokên keç û kur ku hatibe tespît kirin, heke dabîn kirina debara dê û bavê xwe ji aliyê kesê sîgotedariya tenduristiya gelemeriyê ve ne û ev ji aliyê sazûmanê ve li gor krîterên diyarkirî ve hatine tespît kirin, di vê bergehê de ne. Encax kesên bendewar ku van şertên wan bidawî bûne, bi dayîna prîma STGyê ve binbar in.

Bi rêkûpêkkirineka 2013an, beriya tarîxa 01.10.2008ê de zarokên keç ku ji dayîk bûne heke beriya vê tarîxê ji ser dê û bavê xwe xwediyê heqê girtina alîkariya tenduristiyê be, piştî 18 salê xwe tije ke jî, wek mînak zanîngehê qezenc nekin jî dê mecbûr nemînin ku prîma STGyê bidin û sûdwergirtina ji sîgorteya tenduristiyê ya bavên xwe bidomînin. Jinên ku dîsa zewicîne û dev ji hev berdane jî, heke ne di bergeha tu sîgortayê de bin jî nû ve ji sîgorteya tenduristiyê ya bavên xwe dê bikaribin destpêkin. Encax piştî tarîxa 1.10.2008ê de zarokên keç ku ji dayîk bûne, piştî 18 salê xwe tije bikin an jî derbaskirina sînorê temenê ya bi girêdayî şerta hindekariyê ku li jor hatiye diyar kirin ve dê bibin STGyê. Ev rewş, wek pêkerekê ku jina sewkê zewacê bike, bendewariyên wan zêde dike xuya dike.

Ji ber xwendekariya dibistana amadeyî û saziyên tayê hev de zarokên ku ji xizmetên tenduristiyê sûd werdigrin, bi şerta tarîxa ku emrê xwe yê 20 salê tije bikin derbas nekin, ji tarîxa bidawîbûna vê perwerdehiyê pêve, bi mudeta 120 roj di heman bergehê de sûdwergirtina ji xizmetên tenduristiyê dikarin bidomînin.

Di sîstemê de pêşkêşkerên xizmetên tenduristiyê ji aliyê Wezaretê Tenduristiyê ve wek qedemeyên yekemîn, duyemîn û sêyemîn hatine tasnîfkirin. Di vê tasnîfkirinê de hekimên malbatê wek qedemeya yekemîn ya pêşkêşkerê xizmeta tenduristiyê cih digrin.

Sîgotekiriya Tenduristiya Gelemerî û kesên ku bi lînêrîna wan binbar e, mecburin ku riayetê rêza sewkê ya ku ji aliyê SGKyê ve hatiye diyar kirin bikin, hekena sîgotekiriya tenduristiya gelemerî li gorî qedemeya ku jê sûd werdigre para beşdariyê yan jî mizeyên îlawe dê bide.

Herwiha, sîgotekiriya tenduristiya gelemerî û kesên ku bi lînêrîna wan binbar e, di nava sala beriya tarîxa ku ji pêşkêşkerê xizmeta tenduristiyê re serî lê da ye de, pêdiviya dayîna bi tevahî 30 roj prîma sîgorteya tenduristiya

gelemperî heye. Kesên ku di bergeha STGyê de hatine tescîl kirin, ragihandina serlêdana têsta derametê ku ji wan re hatiye teblîx kirin, ji wî tarîxê pê ve di nav mehekî de divê ji Weqfa Alîkarî û Piştewaniya Civakî re murecaet bikin.

Di nav mudeta mehekî de ku dabaş e, kesên ku ji bo têsta derametê serî lê nedane, ji tarîxa destpêka tescilê pê ve ji derameta nav malbatê ku ji serane dikeve wek meblaxa mehaneyê, bi esas girtina du qatê mizeya asgariyêve primên wan tên pêk anîn ¹⁹.

Tablo 4. Bi Encama têsta derametê li gorî rewşa derametê meblaxa primên ku bê dayîn (Tîrmeh-Berfanbar Heyama 2015ê)²⁰

Statûya STG	Rewşa Derametê	Prîma Ku Bê Dayîn (Sala 2015ê)
60/1(c-1)	Ên ku ji 1/3 mizeya asgariyê kêmtr in < 424,50	Ji aliyê dewletê ve tê pêşwazîkirin
60/1(g-1)	Ên ku ji 1/3 mizeya asgariyê heta ji mizeya asgariyê ne (424,50 - 1.273,50)	$(1.273,50 / 3) \times \%12 = 50,94 \text{ TL}$
60/1(g-2)	Ên ku ji mizeya asgariyê heta du qatê asgariyê ne (1.273,50 - 2.547,00)	$(1.273,50) \times \%12 = 152,82 \text{ TL}$
60/1(g-3)	Ên ku ji du qatê mizeya asgariyê zêde ne > 2.547,00	$(1.273,50) \times 2 \times \%12 = 305,64 \text{ TL}$

¹⁹ Tîrmeh-Berfanbar 2015ê de mizeya asgariyê ya brutê 1.273,50 TL binin ber çavan, meblaxa ku divê were dayîn 305,64 TL ye. Ev mudet ji bo yên ku di bergeha benda jêr (60/1 (c-1)) ya Qanûnê de hatine tespît kirin, ji wan re “Ragihandina serlêdana têsta derametê” ji tarîxa teblîxkirinê pê ve şeş meh e.

²⁰ Di bergeha Zagona Torbe ya bi hejmar 6552 ku di tarîxa 11ê Îlon ya 2014an de ketiye meriyetê, deynên primê ku ji ber sîgorteya tenduristiya gelemperiyê pêk hatiye ji nû ve hatiye saz kirin. Li gor zagonê, kesên ku deynên wan ji saziyê re hene divê heta tarîxa 3yê Mijdara 2015an serî lê din. Kesên ku heta vêga qet têsta derametê çênekirine heke ji tarîxa 30.09.2015ê re serî lê din, ji ser hejmara ku li gorî encama têtê bê kirin were diyarkirin aslê deynê heta tarîxa 30.11.2015an bi tevahî were dayîn wê demê dê bikaribin wek bîfayiz deynên xwe bidin. (geçici md. 60).

Ji ber ku sîstema Sîgorteya Tenduristiya Gelemerî li ser mentîqa deyndarkirinê ava bûye gelek kesan û jinên ku di nav tîkiliya xebata qismî de ne mexdûr dike. Bi ser de di van deman de ku deyndar bûne nikarin ji sîgorteya tenduristiya gelemerî jî sûd werbigrin. Halbûkî ji sîstema Sîgorteya Tenduristiya Gelemeriyê re destpêka yekem, divê ji tarîxa ku ji xizmetên tenduristiyê sûd werdigrin pê ve bibe. Ji ber vê sîgortakiriyên tenduristiya gelemeriyê ku tabîê têsta derametê ne divê deynên wan ên STGyê tev were heşifandin.

Prîma STGyê ya Kesên ku Qismî Dixebitin

Kesên di bergehê 4 (a)yê de bisîgortebûne pê re, li gorî Qanûna Kar a bi hejmar 4857ê bi dema qismî yan jî li ser bangê dixebitin û sîgortedarîyên ku li gorî vê Qanûnê di xizmetên nav xaneyê de ji 30 rojê kêmtir xebitîne primên sîgorteya tenduristiya gelemerî yên rojên ku kêmane, divê 30 rojê re temam bikin. Divê ev sîgortedarîyan mîracaatê Weqfa Alîkarî û Piştewaniya Civakî bikin têsta derametê çekin û ji ser sewiyeya derametê ku li gorî encama têsta derametê ve hatiye diyarkirin bi prim dayînê divê rojên xwe ji 30 rojê re temam bikin.

Payên Beşdariyê

Diyarkirina xizmetên tenduristiyê ku finansmanê wî dê were peyde kirin, metodên teşhis û tedawiyê û cureyên xizmetên tenduristiyê, mîjera wan û mudeta bikaranîna wan ve Saziya Ewlehiya Civakî rayedar e. Halên ku kesê Sîgortedariya Tenduristiya Gelemeriyê û naskiriyên ku bi lîstîna wan binbare tîkildar dike û di halên ku paya beşdariyê nayê girtin de, muayeneyên hekime malbatê û xizmetên tenduristiyê piştewan ku arasteyî şexsê re ye hatiye terîf kirin.

Bi şerta bi belge kirina rapora tenduristiyê ve; nexweşiyên kronîk ku ji aliyê saziyê ve hatine diyar kirin û proteza jîngiringî, ortez û organ, tevînek û veguhêziya hucreya kokê jî di nav xizmetên ku paya beşdariyê nayên girtin de ne. Encax hekimên malbatê xaric, di tedawiya şîpya de hekim û muayeneya hekimê diranê, dermanên ku di tedawiya şîpya de hatine peyde kirin, protez û ortezên derveyî gewdeyê, tedawiyên metoda zêdebûna alîkar, li gorî komên nexweşîna ku ji aliyê saziyê ve dê were diyarkirin, di tedawiyên raketinê de xizmetên tenduristiyê ku finansmana wan hatine peydekirin de, di rêjeyên çeşîtdar paya beşdariyê tê girtin.

Di hesabkirina payên beşdariyê de, meblaxa xizmetên tenduristiyê esas tê girtin. Usulên dayîna payên beşdariyê, di rêznameya ku ji aliyê Saziya Ewlehiya Civakî ve pêk bû ye tê bi keyskirin. Ji bo tespîta xizmetên tenduristiyê ku jê

paya beşdariyê nayê girtin Saziya Ewlehiya Civakî; ji bo diyarkirina bedelên xizmeta tenduristiyê ku ji aliyê Saziya Ewlehiya Civakî ve dê were dayîn, Heyeta Fiyet Eyar Kirinê ya Xizmetên Tenduristiyê rayedar e.

Zanîngehên Weqfê tê de, pêşkêşkerên xizmetên tenduristiyê bi taybet peymananî, ji aliyê Heyeta Fiyet Eyar Kirinê ya Xizmetên Tenduristiyê ve bedelên xizmetên tenduristiyê ku hatine diyarkirin, heta du qatê wî (ji %200ê wî) dikarin mizeya îlawe teleb bikin (md. 73). Halbûki ev rêje gava zagon hê nû derketibû ji %20 bû. Piştê qatek (ji %100) zêde kirine. Herwiha, ji bo diyarkirina qarçika vê mizeyê Civata Wezîran hatiye rayedar kirin.

Zelîxa ji Tîrmeha 2015an pê ve tabî statûya sîgortedariya 4(a)yê ve wek qismî demî dixebite. Zelîxa ya ku di xaneyekî de nexweş dinêre sîgorteya wê di mehê tenê 15 roj tê dayîn û beramberê vê 15 rojê jî, qedera ji nivê mizeya asgariyê mehane distîne. Ji ber ku ji bo 15 rojên xwe yê ku kêr maye prîma STGyê dide, mecbur dimîne têsta derametê çêke. Mehaneya brut a 15 rojane ya Zelîxayê teqabulê $1.273,50 / 2 = 636,75$ TLyê dike. Li gorî meblaxa derameta ku bi encama têsta derametê ve hatiye hesabkirin, prîma STGyê ya ku divê Zelîxa bide bi vê awayê tê hesabkirin:

Zelîxa, yên ku mehaneya wan di navbera 424,50 TL (ji 1/3 mizeya asgariyê) û 1.273,50 TLyê de ne di meblaxa 25,47 TLyê ku nivê meblaxa 50,94 TLyê ku didin de prîma STGyê divê bide.

Filîz, di sala 2014an de di emrê 24ê de ji zanîngehê mezûn bûye û hê jî naxebite. Ji ber ku ji zanîngehê mezûn bûye, di derheqê dayîna an nedayîna prîma STGyê de, beriya 2008an de di bergaha sîgorteya bavê xwe de ye yan na, dê were nihêrtin.

Filîz, di dayînen prîman de ji aliyê jinan ve ya ku diyarker e beriya tarîxa 1.10.2008an de, ji ber ku di bergaha sîgorteya bavê xwe yê ku dixebite de ye, piştî mezûnîyetê heta ku nexebite, ji sîgorteya tenduristiya gelemperî ya bavê xwe sûdwerigirtinê dê bidomîne.

Neclayê gava di tu karekî de nedixebite û ji sîgorteya tenduristiya gelemperî ya hevserê xwe sûd werdigre û di Adara 2015an de dev ji hevserê xwe berda ye. Necla wek bêsigorte di malê de bi pereyê ku ji destkariyan qezenc dike ve welayeta zarokê xwe yê 5 salî ku girtiye bi tena serê xwe wî mezin dike. Ji ber ku Necla beriya tarîxa 1.10.2008an de ji ne di bergeha sîgorteya bavê xwe de bû ye piştî devjihevberdanê divê têsta derametê bike. Têsta deramatê nekiribûna, di halê nexebitînê de jî, ji ser du qatê mizeya asgariyê prîma STGyê di rêjeya herî bilind de dê mecbûr bimana bide.

Necla piştî devjihevberdanê têsta derametê çêkiriye. Ji ber ku derameteka ku ji sisê ya yek ji mizeya asgariyê kêm tir hatiye tespît kirin, prîmên STGyê ji aliyê dewletê ve tê dayîn û zarokê xwe û ew bi xwe ji xizmetên ku di bergeha sîgorteya tenduristiya gelemperiyê de ne dê sûd werbigrin.

V. ENCAM

Ewlehiya Civakî, ji dayîkbûnê heta mirinê û piştî mirinê jî kesên ku di paş de dimînin jî bi awayek ku dixê nava xwe mafekî hemgelî ye ku hemû heyamên jiyane di bergeha xwe de dihevine. Encax sîstemên ewlehiya civakî li her derê cihanê di çerçoveya vê fehmberiyê de li serê nayê sekinîn. Li Tirkîyeyê ne weke mefeka hemgelî, wek sîstema sîgorteya ewlehiya civakî ku bi riya prîman finansman tê peydekirin pêk hatiye. Di welatê me de ku beşdariya

îstihdamê bisînor, lê xebitîna bêqeyd zêde ye, bi riya dayîna prîman ve sûdwegirtina ji derfetên sistemê jî bisînor ma ye. Ev rewş bi taybetî ji bo jinan tengasiyên giran derdixe holê.

Di Sistema Ewlehiya Civakî ya Tirkîyeyê de ewlehiya civakî ya jina bi sê awayek hatiye bi rêkûpêkkirin. Ev bi rêkûpêkkirin²¹, jinên ku ji ber xebatên xwe ji misogeriya civakî sûd werdigrin; wek hevserê ku naxibite ji ser mêrê ku dixebite ve ji ewlehiya civakî feydê digire û wek zarokê keç ji ewlehiya civakî feydê digire, bi van awayan derketiye holê.

Gihaniya ji ewlehiya civakî ku ji ber xebatên xwe ve pêk tê, ji peydekirina ewlehiya civakî re ji bo jinan riya herî bi garantî û biberdewamî²² ye. Wek vê rewşê de jinan, her cûre ji kiryariyên sigorteya civakî dikarin feydê bigirin û ji ber sigortedariya xwe heqê malnişiniyê qezenc dikin. Wek rewşên zewac û dev ji hev berdanê de ev mafên ku ji ber sigortedariya xwe qezenc kirine ji holê ranake. Encax ev rewş bi ketina jiyana xebatê ya jinan ve eleqedar e. Li gorî îstatîstîkên TÜİKê ya sala 2014an, nivê nifûsê Tirkîyeyê ji jinan pêk tê û pê re, li gorî mêran di rêjeya ¼an de beşdarê îstihdamê dibin²³. Ev rewş, ji kiryariyên sigorteya civakî ya ku bi girêdayî dayîna pirîman û xebatê ve ye, wek sigortakiriyê çalak li gorî mêran di rêjeyên kêmtir de feydedîtina wan nişan dide. Di Sistema Sigorteya Civakî ya Tirkîyeyê de rewşeka din ku jin ji misogeriya civakî feydê digirin, nexebitîna wan û ji ber vê jî ji ser hevserên xwe wek sigortakiriyê pasîf ji ewlehiya civakî feydegirtina wan e. Di vê rewşê de jin, heta ku hevserê wê bijî ji sigorteya wî, gava bimre jî ji ser hevserê xwe ji mehaneya mirinê sûd werdigre. Encax hebûna têkiliyeka wuha di navbera hevseran de têkiliya zewaca fermî pêdivî dike. Gava hevser dev ji hev berdidin, jin bi temamî bêtemînata civakî dimîne. Di wek vê rewşê de ewlehiya civakî ne wek mafek, ji bo jinan wareka bi girêdayî mêran ve ku temas dike tê ber me.

Rewşeka din ku jin ji misogeriya civakî feydê dibînin, wek “zarokê keç” ji ser dê yan jî ji ser bavê xwe, ji sigorteya tenduristiya gelemperiyê yan jî ji mehaneya mirinê feydedîtina wan e. Di her du rewşan de jî mefê ku zarokên keç ku bi dest xistine, gava dest bi xebitîna dikin an jî gava dizewicin tê birîn. Mafeka wuha ku jin qezenc kirine, ji ber xebitîn û zewacê birîna vê mafê, jinan ji jiyana xebatê dûr dixîne.

Li Tirkîyeyê Sistema Ewlehiya Civakî, bi paldayî wek tîpîk esasa jiyana xebatê û dayîna primê re û herwiha di çerçoveya rawêja xebatkarê mêr de ava bû ye. Ji vê awayê ji ewlehiya civakî feydegirtina jinan di sektorên nefermî de di karekî bigarantî de xebitîna wan; hekena ji mêrekî ku dixebite re wek bendewar bûyîne pêdivî dike.

21 Alper Y. vd., (2015), “Bandora Mehaneyên Ku Ji Sigorteya Mirinê ve Hatiye Girêdan Li Ser Beşdariya Hêza Karê ya Zarokên Keç Re û Li Ser Îstihdama Wan Re”, Kovara Aboriya Ramyariyê û Pêşlêgerîna Rêvebirîtiyê, Aboriya Xebatê ya 16.emîn û Kongireya Têkiliyên Pişesaziyê ya Hejmara Taybet, 341.

22 A.g.e., 341.

23 <http://www.tuik.gov.tr/PreHaberBultenleri.do?id=18619>

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE? JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

Di îstihdama ketî ya jinan ber de, xebitîna bêqeyd a belavbûyî jî jinan, karên ku dahat tîne bikin jî, li dervehiya sîstema biprîmê de tîne hiştin. Ji hêla din birêkûpêkkirinên ewlehiya civakî, jinên ku wek xebatkarên bêmime yê malbatê ne nayne berçav, ev sedema heta dawîya emrê xwe ji mîrên malbatê re wek jiyaneke bendewar dibe.

Bi hejmarek kêr jî ku di nav sîstema Ewlehiya Civakî de cih girtine, di derawayên wek ên mîran de tîne terîfkin. Ji aliyê din ve, jinên ku di sektorên nefermî de cih girtine jî ber belavbûna xebata apîtîkê, di bin tehdîteka giran a bêtemînatiyê de ne. Bi navbeynkariya buroyên îstahdamê ya taybet ve karkeriya demî/demanî ya ku tê xwestin li ber jinan de wek rîskeka girîng disekine.

Weka ku li jor jî hatiye diyarkirin cih girtina di nav sîstema ewlehiya civakî encax bi prîm dayîne mimkin dibe. Jinên ku bêqeyd dixebitin an jî bêmime karkeriya malbatê dikin ji bo ku bikevin bin vê şemsiyeyê derfeta sîgortedariya li gor daxwazê tê dayîn. Encax him zêdebûna meblaxa prîman him jî di jîwariya bicihanîna şertan ev sîgortedariya li gor daxwazê tenê li ser kaxîzê dihêle. Herwiha gava bi kategoriyên sîgortayê din ve tê muqayese kirin misogeriya ku tê peyde kirin bêtir di cihekî paş de dimîne. Jinên ku biqeyd bixebitin jî, yê ku di nava tîkiliya karên demî de cih girtine yan jî ji xeynî xebatên nîv-demî ji wan re alternatîfek din nehiştin, bicihanîna şertên ku hatine xwestin teminata xwedîbûna paşerojê hema hema bêderfet e.

Sîgortedariya li gor daxwazê ji hêla derfetên ku peyde dibe de ji kategoriyên din bêtir xwedî qadeka teng e lê encax jinên ku derameta wan dayîna prîman perçînî dibe jî dixwe nava xwe.

▶ Wek Platforma KEÏGÊ di sala 2008an de, ji Sîgortayên Civakî û Sîgorteya Tenduristiya Gelemperiyê (SSGSS) jî jinan re çî anîye raporeka ku van analîz kiriyê amade kiribû. Di vê raporê de me dîtibû ku jinan ne wek ferd, wek bendewarê mîrên malbatê tesfir kirine û ewlehiya civakîyê ku bi paldayî sîstema prîmê ve ye ji jinan qîsmekî mezin li dervehiya vê şemsiyeya hêvîşandinê de hiştiye. Gava em tîne sala 2015an, ev 7 salane ya ku derbasbûye de sîstema ewlehiya civakîyê di heman çerçoveyê de maye hetta em bêjin di hin qadan de bi paş ve çûyî jî pêkhatiye dê ne çewt be.

▶ Wek mînak; Qanûna bi hejmar 6552yê ku di sala 2014an de derketiye û “Madeya îlawe 9” ku ji Qanûnê re anîne ji hêla karkerên malê ve, biryarên Dadgeha Bilind ên ku rîya sîgortebûyîna karkerên malê yê ku di heftê rojê be jî bi bendewarî diçûn mala ku dixebitin vekiribû bîfonksiyon hiştiye.

Di şûna tîgîhîna ku jinan wek kesên ku di civakê de ji hilberanê re tîkariyan dikin bisekin û piştgiriya wan bikinê de, hê jî tîgîhîneka wan wek bendewarên ji mîrên malbatê re dîtin mewcûd e. Kêmbûna misogeriya civakî

ku hatiye peyde kirin jî pirsgirêkeka girîng e divê bi taybetî were kirpin. Di sistemê de bi birêûpêkkirina dawî ve ber bi standardbûnê ve çûyîn xuya bike jî standardbûyîneka diyar ne dabaş e. Sistema ewlehiya civakî gelek xebatên jinan ku di nav xaneyê û li dervehiya xaneyê de dikin nayne ber çav. Bi pê re di qada ewlehiya civakî de ji hêla jinan ve gelek birêkêpêkirinên ku hatiye çêkirin jî jinan ji jiyana xebatê dûrdixîne yan jî sewkê xebata bêqeyd dike. Wek mînak, zarokên keç ku ji ser dê û bavê xwe mehaneya mirinê distîne gava dest bi xebitîna dike birîna vê mehaneyê, gelekî jinan sewkê xebitîna bêqeyd dike yan jî bi endîşeya birîna mehaneya mirinê di ketina jiyana xebatê de dilsar tevdigerin.

Di qada ewlehiya civakî de qismeka birêkêpêkkirinên ku hatine jî ji hêla jinan ve sepanên kêr û ne yeksan dihewîne. Wek mînak, mêran ji bo ku ji deyndarbûna leşkeriyê sûd werbigrin beriya ku herin leşkeriyê şerta sîgortebûyîne nayê gerîn lê; jinan ji bo deyndarbûna zayînê bikin ji bo wan şerta sîgortebûyîna beriya zayînê tê gerîn. Bi pê re, ji jina sîgortakirî ku xwedî zarokê astengdar e re mafê malnîşînîbûyîna zû ku hatiye nasîn, ji ber gelek tengkirinan ji gihîna armanca xwe dûr e. Wek mînak, jina sîgortakirî ku ji yekî zêdetir xwedî zarokên astengdar e, tenê ji van zarokan yekî re vê mafê dikare bi kar bîne; li gorî hukmên Qanûna Saziya Xizmetên Civakî û Hêvişandina Zarokê hêvişandina wek biberdewamî û şevîn, sûdwergirtina mizedar an jî bêmize ji xizmetên lênêrîn û rehabilitasyonê de jina sîgortakirî ji van mafan feydê nagire.

Bi kurtasî li Tirkîyeyê gava ewlehiya civakî dabaşa mijarê dibe jinan ne wek ferd, di nav malbatê de û di nav têkiliya zewacê de tesfîr dike. Em wek Platforma KEÎGê, ewlehiya civakîyê mefeka bingehîn e bo mirovan em dixwazin vê bi taybet binxêz bikin. Bêyi nihêrtina derameta hemû ferdan û xebitîna wan a biqeyd, di çerçoveya mafên mirovan de sîstemeka ku di bin şemsiyeya ewlehiya civakî de cih girtina wan dê peyde bike divê ava be.



LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê




LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê



LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê



LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê



LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê



LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

LI TIRKÎYEYÊ JIN DI EWLEHIYA CIVAKÎ DE LI KU DERÊ NE?
JI HÊLA ZAYENDA CIVAKÎ
VE DAHÛRANA QANÛNA SCSTGYÊ YA BI HEJMAR 5510Ê

www.keig.org

KEiG
kadın emeđi ve istihdamı giriřimi
women's labor and employment initiative

destekleyen

